


Serpêhatiyên  
**TOM  
SAWYER**



hêlm



MARK TWAIN

# Serpêhatiyên Tom Sawyer

*Wergera ji îngilîzî: Ergîn Opengîn*



**HÊLÎN: 3**

**Tom Sawyer (1876)**  
**Serpêhatiyên Tom Sawyer**  
**Mark Twain**  
**Wergera ji inglîzî: Ergîn Opengîn**

**Berg: Azad Aktürk**  
**Rastkirin: Şerîf Derînce**  
**Çapa Yekem: 2009, Stenbol**  
**Çap: Berdan Matbaası**  
**Sadık Daşdöğen Davutpaşa Cad.**  
**Güven San. Sit. C Blok, No: 239**  
**TOPKAPI / İSTANBUL**  
**Tel: (0212) 613 12 11**

**© Avesta, 2009**  
**Ji xeynî danasînê bêyî destûra**  
**weşanxanê bi tu awayî nayê kopîkirin**

**AVESTA BASIN YAYIN**  
**REKLAM TANITIM MÜZİK DAĞITIM LTD. ŞTİ.**  
**Hüseyin Ağa Mahallesi Sakız Ağacı Caddesi**  
**Öğüt Sokak No: 7 BEYOĞLU / İSTANBUL**  
**Tel-Fax: (0212) 251 44 80 (0212) 243 89 75**

**Ekinciler Caddesi Nurlan Apt. Giriş Katı No: 2**  
**OFİS / DİYARBAKIR Tel-Fax: (0412) 223 58 99**

**[www.avestakitap.com](http://www.avestakitap.com) / [info@avestakitap.com](mailto:info@avestakitap.com)**

**ISBN: 978-9944-382-70-0**

MARK TWAIN

# Serpêhatiyên Tom Sawyer

Wergera ji inglîzî: Ergîn Opengîn





## 1. Tom sêncê badane dike

“Tom!”

Bersiv nîne.

“Tom!”

Bersiv nîne.

“Çi li vî kurî hat dîsa? Hêê Toom!”

Bersiv nîne. Pîrejinê berçavkên xwe hindekî daxistin û çavên xwe li rex û çanên odeyê gerandin.

“Baş e! Heke tu ber lepên min bikevî, ez ê...”

Gotina xwe neqedand, ji ber ku niha



tewiyabû û bi gêzikekê seh dikire binê ranzeyê.

“Min kurên wekî wî hîç nedîtine!”

Çû ber deriyê vekirî û li wir berê xwe da nav bacan û giyayên baxçeyî. Tom diyar nake. Bi dengê bilind bang kir:

“Law Tom!”

Dengedengê sivik bihîst li pişt xwe. Durist di wextî de zivirî da ku lawikê bi-



çûk, di navmilên sakoyê wî re bigire û nehêle ji nav destan bifilite.

“Wê derê! Min çima fikra wê dolaba veşartî nekir heta niha? Te çi dikir li wir?”

“Çu tişt.”

“Çu tişt! Li destên xwe binêre. Li devê xwe binêre. Ev çi ye?”

“Nizanim Xalet.”

“Belê, ez dizanim. Rîçal e... Aha ev e. Min sed carî ji te re gotiye, heke tu destê xwe li wê rîçalê bidî ezê te kevil bikim. Ka wê kêrê bide min.”

Şivik, li hewa, li ser serê lawikî zîz bû; pîr xeter bû...

“Li pişt xwe miqate be Xalet!”

Pîrê li dora xwe zivirî û daw û demana xwe ji xeterê xelas kir. Di gavê de lawikî baz da û filitî. Li ser sêncê (tan, çît) depîn î bilind, xwe havêt û ava bû.

Xaleta wî bîstekê mat ma û paşî bi xwe

bi xwe hêdîka kenî.

“Lawikî zeft bike, qey ez çu carî baqil nabim? Gelo, ma kê mî caran wî ez wiha lêbandime ku aniha ez li wî digirim? Lê Xwedayê mezin, maxwe çu caran du rojan eynî fêlê nake! Mirov dê çawa bizane ka dora kîjan fêlê ye. Diyar e baş dizane ka heta kengî ez tehemmul dikim; herwiha dizane ku heke bikare ji bo bîstekê min bixapîne û bi wî awayî min bikenîne em dê dîsa vegerine serî û ez dê dil nedim destê xwe lê bidim. Xwedê jî dizane ku ez wezîfeya xwe ya li ser wî lawikî bi cî nanînim. Erê welleh, Xwedê lê alim e. Şivikî hazir ke û lawikî bîne ser rêka rast, wek ku Mishefa Pîroz dibêje. Na, ew lawê rehmetiye xwişka min e. Xerîbê Xwedê, dilê min qayil nabe ku ez li wî bidim. Piştî nîvro ew dê bêtkabêtê (şilî-milî) bilîze û ji bo ku wî ceza bikim ez dê sibe hindek kar û şolan pê bidim kirin. Rojên şemiyê, ku hemî zarok di bêhnvedanê de ne, karkirin

pir zehmet e. Herwiha, di dinyayê de Tom ji her tiştî bêtir ji karkirinê nefret dike.

Bi leyîstina bêtkabêtê demeke pir xweş bihurand. Gelek dereng vegeriya malê ku arî Jim, lawikê reş î biçûk, bike. Karê wan, ji bo spêdê darşikandin, û ji bo şevê berhevkirina çilke-daran bû. Dereng bû, lê qe nebe li wir bû ku serpêhatiyên xwe ji Jim re bêje. Sidê birayê biçûk ê Tom, lawikekî bédeng û bêçîr, ji zû de karê xwe yê komkirina çilke-daran qedandibû.

Spêdeya şemiyê, her der bi tîrêjên rojê ve xemilbû û li her derê jiyan diherikî. Di ber her dilekî de stranek hebû; û heke dil dilekî ciwan ba muzîkê xwe digihande lêvan. Kenekî xwe bi hemî rûyan ve girtibû û bihar hebû di her pêngavê de.

Tom di dest de zerikeke avkirêcê û firçeyekî destikdirêj, li ser peyarêyekê xuya bû. Çavên xwe li dora sêncê gerandin. Kêfxweşî pê re nema û xemgîniyek kete nava dilê wî. Sê hektarê sêncê depîn ku

neh mîtroyan jî bilind. Bêhneke axînî ve-  
da û firçeyê xwe di avkirêcê ra kir. Ji de-  
pê jorîn dest bi badanê kir. Bi jor de bir-  
jêr de anî, her ew kar dubare kir; li beşê  
sêncê yê boyaxkirî û zeviya mezin nihêrî  
ku bi sêncê neboyaxkirî ve rapêçayî bû.  
Hêvîşikestî, rûnişt ser kutikedarekî. Di  
dest de cêrek, dev de stranek, Jim ji deri-  
yê hewşê derbas bû, hat. Tom heta niha,  
ji avkêşana li ser kaniya gund her û her  
nefret kiribû, lê niha karekî zêde zehmet  
nedixuya. Hat bîrê ku li ser kaniyê şirîk û  
heval hebûn. Lawikên spî, melez, reşik û  
keçik her li wir bûn. Heta wextê vegera  
xwe li wir disekinîn, pêlîstokên xwe bi  
hev diguherin, şer dikin, pev diçin, tina-  
zên xwe bi yekûdu dikin.

Tom: “Ê, de Jim, heke tu hindekî firçe  
bikî ez dê biçim bedela te avê bînim.”

Jim serê xwe hejand û got: “Nikarim  
Tom. Pîrekê gote min ku divê ez biçim û  
bêyî ku bi yekî re biştexlim zûka wê avê



bînim. Ji min re got ku 'Marse Tom dê derkeve pêşiya te û alîkariyê ji te bixwaze' û got, 'guh nede wî, dewamî karê xwe bike, got ku boyaxê ew dê çêke!'

“Ohoo, tu guh nede wê, Jim. Ma tu nizanî ew hergav wesa diaxive. Cêrikê bide min, ez dê di gavê de vegerim. Qet haya wê jê çênabe. Ez ê xareke spî bidime te! Ez dê birîna tiliya pêyê xwe jî nîşanî te bidim.”

Jim jî mirov bû, û ev şêrînî ne kêm, lê zêde jî bûn. Zerika xwe danî, mîl jê wer-girt û gava ku Tom bandaj jê vedikir, Jim tewiya ser tiliyê. Piştî bêhnekê zerika di destê xwe de dizingiland û bi jêr de dibezî. Tom badane dikir û Xaleta Polly di dest de fera şimikekê, vedigerî malê.

Lê quweta Tom xelas bû, betilî. Li leyîstok û tiraneyên ku ji bo îro plan kiribû fikirî, û xemgîniya wî zêdetir lêhat. Di nav bîstekê de, lawik dê bihatana geriyane û dê tinazên xwe pê bikirana ji ber ku mecbûr bû kar bike. Û dîsa xîret hatê!

Rahişte firçeyê xwe û hêdî hêdî dest havête karê xwe. Zêde nebuhurî, Ben Rogers diyar bû, di nav hemî lawikan de xweda-

nê diwartirîn tinazan bû. Benî sêvek dixwar û ji kêfxweşiya xwe dikire qareqar.

Tomî qet bala xwe nedayê û dewamî karê xwe kir. Lawikî bîstekê zîq lê nihêrî û got: “Ho ho, tu baş tê wer bûyî, ne we ye?!”

Bersiv nîne. Tom, wek artîstekî li derbê xwe yê dawî nihêrî. Careke din firçeyê xwe bi hişyarî gerand û mîna cara berê li kiryara xwe nihêrî. Ben xwe gihande nê-zîkî wî. Ava devê Tom li pêş sêvê ve dihatte xwarê, lê, berê xwe da karê xwe. Ben, “Merheba dostê qedîm, ew tu dîsa mecbur î kar bikî, hêy?”

Tom, ji nişkê ve zivirî, got: “Weyy, kuro Ben ew tu yî! Min hay ji te nebû.”

“Binêr, ez diçim avjeniyê, ez diçim ez! Ma te jî nedixwest tu jî bihatayî? Lê ya baş, tu kar bike, erê erê tu kar bike!”

Tomî bêhnekê berê xwe da lêwik û got, “Tu ji çi re dibêjî “karkirin”?

“Çima, qey ew ne kar e?”



Tom careke din vegeriya ser badaneya xwe û cewab da. “Belê, belkî wesa be, belkî jî wesa nebe. Lê ez baş dizanim ku kêfa Tom Sawyer pê tê.”

“Ka wê de here! Niha tu dibêjî ku tu hez jê dikî?”

Firçe hêj hereket dikir.

“Hez jê dikim? Ma ji bo çi hez jê ne-



kim? Qey herroj derfeta badaneyê bi dest lawikekî dikeve?"

Bi vê gotinê ve berê coyê guherî. Ben êdî nema sêva xwe diqirand. Tom firçeyê xwe bi destxweşî pêş de dibir û paş ve dianî. Pêngavekê vekîşiya ku li ciyê boyaxkirî binihêre, li vir li wir firçe li hin deran da. Ji ber hereketên Tom, Ben mat ma û zêdetir bala xwe dayê. Her ku çû zêdetir kete nav! Zêde nebûbû ku got: "Tom, bide hindekî ez badane bikim."

Tom fikirî, tam dê bigota "bila", lê fikra xwe guhert: 'Ne ne qet nabe, Ben. Tu dizanî, Xaleta Polly li ser wê sêncê zêde zêde hessas e; tu dibînî tam li ser rêkê ye. Heke sênca hêla piştê bûya, çu tişt nedibû. Hingî ne min deng dikir, ne jî wê. Erê welleh, li ser wê sêncê pir hessas e; divêt gelek bi hişyarî bête çekirin. Ez ne bawer im ku ji nav hezar, duhezar lawikan yek derkeve ku bikare vê navbeynê rast û durist çêke."

‘Ne nee! Tu bi Xwedê ke? De de, qe ne-  
be berde biceribînîm. Tenê pîçekê lo. He-  
ke tu li ciyê min bayî, min dê bida te  
Tom.’

“Ben, welleh bi ya min ba min ê bida te,  
lê Xaletta Polly heye. Jimî xwest boyax bi-  
ke, wê nehêla; Sidî jî xwest çêke, neda wî  
jî. Niha tu nabînî ku ez çi qas lê germ bû-  
me? Heke tu dest bavêjîyê, û tiştêkî nebaş  
lê bêt...”

“Yaa Xwedêê, kuro ez dê zehf lê hişyar  
bim. De ka bide. Bila, ez dê nîvê sêva xwe  
bidime te.”

“Baş e, ha ji te. Na na Ben nabe. Ez di-  
tirsim.”

“Ez dê hemiyê bidime te!”


Tom firçe berda. Wextê ku Ben li bin  
tîrêjên rojê şol dikir û xwêdan dida, Tom  
li ser bîdonekê rûdinişt, piyên xwe dihe-  
jandin, sêva xwe bi mirçemirç dicût, û ji  
bo hin lawikên din plan çêdikirin. Lawik  
giş li wir bûn; hatibûn ku tinazên xwe pê

bikin, lê hemî ketin dorê ku badaneyê bikin. Heynê Ben westiya, Tomî beramberî firfirokekê dor firote Billy. Gava dora wî jî xelas bû, îcar John Miller dest avête badanekirinê. Wî jî ji bo vî karê hanê, cirdoneke mirî û bendikê hejandinê da Tom. Bi wî awayî çend kes û çend saet derbas bûn. Êdî dor berêvarî, Tom di nav zengîniyê de digevizî. Ji bilî tiştên behs lê hatiye kirin, danzdeh mîl, parçeyeke gîtara cihûyan, kere-şerbikekî cam î şîn ji bo têrenihêrînê, meqereyek, mifteyek ku kêrî vekirina çu tiştî nedihat, qetek tebeşîr, dervankeyekî camî ê şûşeyan, leşkerekî teneke, cotekî şînikan, pişîkeke yekçavî, destikederekî sifr, stûvaneke kûçikan -lê ne kûçik bi xwe- destikê kêrekê, çar tûkilên pirteqalan û textikê kevne pencereyekê jî bi dest xistibûn.

Welhasil, di wê navberê de bi hevalan re wextekî baş buhurandibû. Herwiha, sê qat badane jî li ser sêncê derbas bûbû.

Îcar, bêyî ku qest lê bike, qanûneke muhîm jî derheqê mirovan de kifş kiribû: Heke tu bixwazî tişteki bidî hezkirin, wî tiştî ji bo bidestxistinê zehmet bixe. Ewe bes e.

Tom derket ber Xaleta Pollyê ku di odeyeke pişta xanî de rûdinişt. Havîna germ, bêdengî û bêhna kulîlkan ketibû herderê. Xalet li ser şîşikên xwe xilmaş bûbû. Wesa fikirîbû ku Tom zû de ye ji kar reviyaye loma heyirî dema ew li pêş xwe dît.



Tom: "Xalet, niha ez dikarim biçim bi-  
leyîzim."

"Çi! Wiha zû? Te çi qas çêkir?"

"Hemî, Xalet."

"Tom, derewan neke, kêfa min bi dere-  
wan nayê!"

"Derewan nakim Xalet; sênc hemî ba-  
danekirî ye."

Xaleta Polly, derket derve ku bi çavên  
xwe bibîne. Heyirî!

"Waa, ez qet li hêviya vê hindê nebûm!  
Çi kêmasî jî nîne. Dema tu guh didî miro-  
van tu baş kar dikî. Lê, bi rastî tu kê m ca-  
ran bi ya mirovan dikî. Baş e, tu serbest î,  
here bileyîze."

Heynê Tom di ber xaniyê Jeff Thatcher  
re derbas dibû, li nav baxçe çavê wî li ke-  
çeke nûhatî ket. Tişteke çavşîn û şêrîn, bi  
porê zer ku kiribû du keziyên dirêj û ci-  
lên spî yên havînî.

Bêyî ku wê pê bihesîne, bîstekê çav li

wê horiya hanê kir. Ji nişkê ve pê hesiya ku keçik wî dibîne; û xwe wesa da xuyakirin ku qaşo wî nedizanî ku keçik li wir bû. Dest bi hereketên zarokane kir da xwe bide hezkirin. Bîstekê dewamî li hereketên xwe kir. Lê, di nîvê yek ji wan cembaziyên xwe yên xeter de, çavê wî pê ket ku keçik ber bi malê ve dimeşe. Tom derket ser sêncê û bi hêviya ku keçik hindekî din bisekine xwe dirêjî ser sêncê kir. Keçik bîstekê li ser derencekan sekinî, û ji aliyê derî ve meşiya. Dema wê pêyê xwe danî ser şemîkê, bêhna Tom hindekî teng bû. Lê di gavê de ser û çavên wî biriqîn; berî ku ava bibe keçikê binefşek havêtibû ser sêncê.

## 2 . Tom, Bucky Thatcherê dinase

Spêdeya duşemê, Tom bi dilekî xemgîn Shişyar bû. Hemî spêdeyên duşeman ji bo wî wiha bûn, ji ber ku li dibistanê eziyeta heftiyê nû dest pê dikir. Gelek caran di destpêka wê rojê de digot, “Xwezî min qet tehtîl nekiriba”. Hind jê aciz bû ku ji bo wî wekî vegera bo heps û zincîran bû.


Tom, ser taqa piştê dirêjkirî, difikirî. Xweziya nexweşiyekê kir. Bi rastî, rêyek hebû! Xwest ku zikêşiyekê peyda bike, lê ne. Baş bû. Nişkê ve tiştê hate bîrê; dira-

nekî wî yê jorê dileqiya. Eve şanseki mezin bû. Tam dê wek “destpêkerekî” (wekî ew dibêje) dest bi nalînê bikira ku fikrek lê peyda bû. Heke ji Xaletê re bibêje, Xalet dê diranê wî bikêşe û dê pir biêşe. Loma qirar da ku dev ji diran berde û li nexweşiyêke din bigere. Paşê, gotinên doxtor hatin bîrê. Doxtor behsa tiştêkî dikir ku mirov du sê heftiyên dixist nav nivînan û hema dibû sebebê jêkirina tiliyêke wî. Loma lawik tiliya xwe ji bin çarşefê derxist û bi destê xwe girt. Berda girî û nalînê. Lê, Sidê li rex wî, hêj di kûrika xewê de bû, dinivist.

Bi dengêkî bilindtir nalî û êşekê xeyalî di tiliya xwe de hest kir. Sid li ciyê xwe nebizivî.

Îcar xerabtir lê kir. “Sid Sid!”, gazî lê kir û ew hejand. Dîsa dest bi axîn û nalînê kir. Sid bawêşî, vezelî û bi pixepix rabû ser enîşkên xwe. Çavên xwe li Tom gerandin. Tom hêj bi nalênal bû.





Sid, “Tom bêje, Tom!” (bersiv nîne)  
“Dê Tom, Tom! Te çi ye Tom?” Sid, li rû-  
yê Tom nihêrî û ew hejand.

Tom bi nirmenirm, “Oyy! Wesa neke,  
Sid. Min nehejîne.”

“Çima, te xêr e Tom. Gazî li Xaletê di-  
kim.”

“Ne ne, dev jê berde. Belkî hêdî hêdî  
çêbe. Gazî çu kesî neke.”

“Lê divê ez gazî yekî bikim! Wesa me-  
nale Tom. Halê te pir xerab e, ji kengî ve

tu di wî halî de yî?”

“Çend saetek in. Ayy, wesa têk nede kuro, tu dê min bikujî!”

“Kuro te çima ez zû hişyar nekirim? Weyy, Tom. Mesele çi ye lawo?”

“Tu ji rexê min ve aza bî, Sid. (nalîn) Ji ber her tiştê ku te li min kiriye aza bî! Piştî ku ez mirim...”

“Weyy, Tom tu namirî, ne? Ne Tom, wey ne ne. Belkî...”

“Ez her kesî efû dikim, Sid. (nalîn) Wiha bêje wan Sid. Û, Sid, darê pencereyê û pisîka min a yekçavî bide wê keça nûhatî û jê re bêje...”

Lê Sid cilên xwe girtibûn û çûbû. Bilez çû qata jêr û got, “Xalet, Xalet Polly were! Tom li ber mirinê ye!”

“Dimire?”

“Belê xanima min. Nesekine, lez ke!”

“Tirovir! Bawer nakim.”

Lê ligel Sid û Maryê bilez derket qata

zorê. Rûyê wê jî zer bû, lêvên wê lerizîn. Bi halekî bêhnçikiyayî gihişte nik nivînan, “Kuro Tom, te çi ye lawo te xêr e?”

“Weyy, Xaletê ez...”

“Lawiko çi qewimî?”

“Weyy, Xalet, tiliya min a birîndar tevi-ziye.”

Pîrejînê xwe havêt ser paldankeke, bêhnekê kenî, paşî bêhnekê giriya û paşî herdu bi hev re kirin.

“Tom, te ez bizdandim. Niha dev ji van keratiyan berde û derkeve ji nav nivînan.”

Nalîn lê xelas bû. Êşa tiliyê aşt bû. Bi xwe jî zanî ku ketibû nav rewşeke seyr. Loma got: “Xaleta Polly, welleh te digot qey tevizîbû, hind diêşa ku min haya min ji diranê min çênebû.”

“Tu bi Xwedê kî? Ka bêje çi li diranê te hatiye îcar!”

“Diranekî min dileqe, pir zêde diêşe.”

“Bisekine law bisekine, dîsa dest bi nir-

menirm û nalînê neke. Ka veke devê xwe. Belê, diranê te dileqe. Lê tu ji ber diranê xwe namirî. Mary, ka ji metbexê ji min re benikekî pembû û hindek perengên komirê bîne.”

Tom, “Weyy, Xaletê tu bi Xwedê diranê min nekêşe. Êdî naêşe. Ez êdî çu caran dema diêşe pê naleyizim. Tu bi Xwedê neke Xalet, min navê ji inekteba xwe paş bikevim.”

“Haa, tu naxwazî? Tu nabê erê? Tu bêje ew hemî ji bo wê hindê bûn ku tu li mal bimînî, neçî dibistanê û biçî masîgirtinê, ne wesa? Tom, Tom ewqas keyfa min bi te tê, lê tu her pê ve yî ku dilê min ê pîr bihêlî.” Di vê navberê de amrazên dirankêşanê amade bûn. Pîrexatûnê serek li diranê wî, û serê din jî bi pêpikê ranzeyê ve girêda. Paşî pereng bi maşikê girte destê xwe û ber bi rûyê lawik ve bir. Diran, niha li ber pêpikê ranzeyê, bi vî alî û wî alî ve dihejiya.

Lê dû zivistanê bihar e. Li dibistanê, her kesî bi çavnebarî li wî dinihêrî; ji ber ku bi xêra valahiya di rêzediranên wî yên jor de, dikarî bi terzekî nû tû bike. Komeke qerebalix civiyabû ji bo şowa wî.

Bîsteke din, Tom rastî sûtara û beredayiyê gund, Huckleberry Finnê kurê serxweşê gund hat. Hemî dayikên gund, ji Huckleberry nefret dikirin, ji ber ku ew torî û bêkar bû, bêmerîfet û bêqanûn bû; û ji ber ku hemî zarokên wan pir ji wî hez dikirin, dixwestin bibin hevalên wî û dixwestin biwêrin mîna wî hereket bikin. Her wekî lawikên din Tom jî li Huckleberry dihesidî. Ji bo wî jî leyîstina bi Huckleberry re qedexe bû. Ji ber vê hindê, her çi gava ku derfeteke biçûk peyda dikir, muheqqek pê re dileyîst. Huckleberry hergav cilên torî û tilingên emirmezin li xwe dikirin, cilên perritî û pinî pinî. Qeraxê kûmê wî diriyabû û şiklekî mîna nûheyvê lê çêbûbû. Sakoyê wî, carên ku li



xwe dikir, digihişte ber paniyên wî û bişkokên jorê diketin bin kemberê. Bi tenê şirîdeke qawîşê bi pantalona wî ve hebû; piştta pantalonê mîna telîs ba dibû û çu tişt jî tê de nebû; gava delingên xwe qet nedikirin, ji ber qirêjê diyar nedikirin.

Huckleberry kû derê bixwasta diçû wir û dihat. Di şevên xweş de li derve; û di şevên sar de jî di bîdonan de dinivist. Ne mecbûr bû biçe dibistanê an dêrê, an jî ji yekî re bêje “mamoste”, an jî bi ya yekî din bike. Her çî gav û her çî ciyê dilê wî lê ba dikarî biçe masîgirtinê an jî avjeniyê, bi qasî ku dixwest dikarî li wir bimîne. Ji bo wî pevçûn ne qedexe bû; dikarî heta derengiyên şevê li derve bisekine. Her car lawikê pêşî bû ku biharan pêxwas derdiket; herwiha payizan jî lawikê dawî bû ku sol li pê dikir. Çu caran ne mecbûr bû xwe bişo û ne jî mecbûr bû cilên paqij li xwe bike; dikarî dijûnên ecêb bide. Li ser darê dinyayê her tiştê ku jiyan pê xweştir

dibû, li ba wî kurî hebû. Hemî lawikên “rêzdar” ên St. Petersbourgê wesa difikirîn.

Tom gazî kir, “Merheba Huckleberyy!”

“Merheba. Ka lê mêze bike. Keyfa te dê pê bê?”

“Kuro ew çi ye di destê te de?”

“Pisîkeke sikitî.”

“Ka bihêle ez mêze kim. Wee, çi qas req e. Te jî kû anî?”

“Min jî lawikekî stand.”

“Ka bêje Huck, pisîka mirî bo çi ye?”

“Bo çi ye? Belalûkan jê dibe.”

“Lawo tu çawa belalûkan bi pisîka mirî jê dibî?”

“Çima; pisîka xwe digirî, di nîvşevê de ku mirovekî zikreş wê rojê hatibe veşartin, diçî nav goristanê. Gava dibe nîvşev cinek dê bê, belkî du, belkî jî sê, lê tu wan nabînî. Tenê dengê ba û belkî piçek axaftina wan jî dê bibihîzî. Heynê wî mi-



riyê zikreş dibin, tu pisîka xwe li dû wan re ba dikî û dibêjî, “Cin dide pey cendek, pisîk dide pey cin, belalûk didin pey pisîkê, ez ji we xelas bûm!” Hemî belalûk dê jê biçin.

“Rast diyar dike, te qet ceriband?”

“Ne, lê pîra Dayika Hopkins gote min.”

“Baş e, wê çaxê wesa ye. Ka bêje Huck, tu dê kengî pisîkê biceribîn?”

“Îşev. Ez dibêjim ew dê îşev li dû kalê Hoss Williams re bîn.”

“Lê, ew roja şemiyê hate veşartin. Qey şeva şemiyê nebiribin?”

“Çawa, te hay ji gotinên xwe heye? Sêhrên wan dê çawa heta nivê şevê li kar bin? Û spêdeya rojê jî yekşem bû. Ez wesa dizanim ku rojên yekşeman cin zêde nagerin.”

“Hîî, min qet fikra wê nekiribû. Rast e. Ez jî ligel te bêm?”

“Erê erê, heke netirsî!”

“Te go tirs? Dê ji çi bitirsim? Tu dê bimewitî?”

“Erê, tu jî bimewite, heke bikarî.”

Gava Tom gihişte avahiya biçûk a dibistanê, bilez kete hundir. Kûmê xwe bi singekê ve kir û xwe avête ser kursiyê xwe. Mamoste li ser kursiyê xwe dinivist, lê ji ber dengedengê hişyar bû.

“Thomas Sawyer.”

“Tom dizanî ku telafûza navê wî bi temamî, ne elameta xêrê bû.”

“Kerem kin!”

“Were vira. Niha bêje, çima wekî her caran tu dîsa dereng hatî?”

Tam dê derewek bikira ku ew keça porzer kete pêş çavên wî, ya ku jê re cembazî kiribûn. Di sinifê de, li wê beşa ku keçik lê rûdiniştin, tenê kursiyê li kêleka wê keçê vala bû. Gavê de got, “Ji ber ku bi Huckleberry Finn re axiftim, dereng hatim.”

Mamoste, “Çi, çi?”

“Dereng ketim ji ber ku bi Huckleberry re diaxiftim.”

“Thomas Sawyer, heta niha min îtîrafe-ke evqas ecêb nebihîstibû. Here, nik ke-çan rûne! Bila eve ji te re bibe hişyariyek.”



Tom, li ser textikê ji dara qajê, nik ke-çikê rûnişt. Bi dizî ve awir li keçikê vedi-dan. Keçik pê hesiya, “tûkê xwe lê şîn kir” û qederê deqîqekê piştî xwe jê da alî.

Heynê zivirî, Tom bi pistepist pirsî:

“Navê te çi ye?”

“Backy Thatcher. Yê te çi ye? Haa, ez dizanim, Thomas Sawyer.”

“Ne ne, bi vî navî ew henekên xwe bi min dikin. Wextê ku ez baş bim, ji min re Tom dibêjin. Tu bêje min Tom, bila?”

Nîvro, heynê dibistan belav bû, Tom di guhê Thatcherê de kire pistepist: “Kûmê xwe bide serê xwe û berê xwe bide malê; hevalên xwe derbas bike û berê xwe bide jêr û vegere, were. Ez jî dê di aliyê din re biçim û vegerim.”

Loma her yek ji wan bi komeke xwendekaran re çûn. Piştî bîstekê her du li serê rêyê gihiştin hev. Dema gihiştin dibistanê, ew tikîtenê bûn. Paşî bi hev re ketin axiftinê. Tom bi balonkan ve dileyîst. Got, “Tu ji şînikan hez dikî?”

“Ne, ez ji wan nefret dikim!”

“Belê, ez jî ji yên sax nefretê dikim, lê meqседа min yên mirî bûn.”

“Ne, min şînik pê çu nîne. Ez miryara benîştçûtinê me.”

“Haa, ez jî. Xwezî min niha yek heba.”

“Tu hez jê dikî? Min benîştekek heye. Ez dê bidime te, bêhnekê bicû, lê paşî bide min.”

Bi rastî jî ev pir baş bû. Benîştê xwe bi dor cûtin û lingên xwe li ser textikî hejandin.

### 3. Serpêhatiyên li goristanê

**W**ekî her caran, wê şevê jî Tom û Sid di saet neh û panzdeh deqan de çûbûn nav nivînan. Duayên xwe kirin û Sid zûka di xew re çû. Tom hişyar bû û sekinî. Dema ew difikirî ku bûbû spêde, saetê ji bo 10ê lê da! Ji ber wê jî bêliv sekinî û çavên xwe li tariyê kutan. Pê de pê de, bê hemdê xwe di xew re diçû. Zengila saetê ji bo 11ê lê da, lê wî hay jê nebû. Dû re nalîneke bi xewna wî ve têkelbûyî ket guhê wî. Deqîqekê paşî, Tomî cil li xwe kirin û di pencerê re derket û li ser banî bi

xuşînfî çû. Dema diçû, yek du caran mewitî û bi miyew miyew xwe avête ser banê kuxtikê daran û li wir jî kete ser erdê. Huckleberry Finn, bi pisîka xwe ya mirî re li wir bû. Lawik pêş ve çûn û di tariyê de winda bûn. Piştî nîvsaetekê, li nav giyayên goristanê yên dirêj û gur de bi zehmetî rê ve diçûn.

Goristaneke rojavayî û kevne-mode bû. Li ser girekî, qedere kîlonîetreyek û nîvan ji gund dûr bû. Sênceke depî î tevlihev goristan dorpêç dikir, ku hin ciyan bi nav ve, û ciyên din jî ver bi der ve diçû; lê çu caran rast nediçû. Tevahiya goristanê bi çîmen û devîyan ve hatibû nixaftin. Hemî gorên kevn li bin axê ketibûn; kêleke goran jî nemabû li ser erdê. Texteyên gilover û rizî li ser goran de dileqîyan, hema ber ketinê bûn. Bayekî sivik li nav daran de weziya. Tom sawa ruhên mirîyan kir, miriyên ku bi hebûna wan a li vir nerihet bûbûn. Lawik pir kêr diaxiftin. Gora ku

li pey bûn peyda kirin û xwe li nav sê reş-  
daran veşartin, ku du sê pêngav li rex go-  
rê, qederek ji wan daran hebûn.

Paşî, bêhnekê bêdeng sekinîn ku ji bo  
wan wek demeke pirr dirêj dihat. Tom bi  
pistepist: “Hucky, tu bêjî ku miriyan pê  
xweş be ku em li vir in?”

Huckleberry bi pistepist: “Xwezî min  
bizaniya. Vira pir tarî ye, ne wesa?”

“Erê bi Xwedê wesa ye.” Nişkê ve Tom  
milê hevalê xwe girt û got: “Şşş!”

“Çi bû Tom?”

“Şşş! Dîsa ew bû. Te nebihîst?”

“Xwedaaa, Toom, ew tên! Bi Xwedê ew  
tên. Em dê çî bikin?”

“Nizanim. Tu bêjî ku ew me bibînin?”

“Wee, Tom ew dikarin di tariyê de jî bi-  
bînin, wekî pisîkan. Xwezî ez nehatiba-  
ma.”

Dengedengê ji qeraxên dûr ên gorista-  
nê gihişt ber guhên wan. Hin şikl di nav





tariyê de nêzîk dibûn û fanûseke teneke û kevn dihejandin ku çirûskên ronahiyê li erdê direşand. Huckleberry hêdîka: “Mi-heqqeq cin in ew. Hem jî sê ne! Xwedêê, Tom welleh em çûyî ne! Bisekine, ew mirov in! Dengêk yê Muff Potterê pîr e!”

“Kuro Huck, min dengêkî dî jî nas kir, yê Injun Joe ye.”

“Erê welleh, yê ku melez kuştî! Xwezî her şeytan bana. Ew dê çi bikin?”

Pistepista lawikan qediya, ji ber ku her sê zilam gihiştibûn nik gorê û du sê pêngavan dûrî lawikan bûn.

“Ha, li vir e” got dengê sêyê; û xwedyê deng fanûs rakir û Dr. Robînsonê ciwan diyar bû.

Potter û Injun Joe ereboka desta dikêşan ku tê de werîsek û du sê bêr hebûn. Barê xwe danîn û dest bi kolîna gorê kirin. Doxtor fanûs danî ser kêleka gorê, hat rûnişt û pala xwe da darreşekê. Hema ber difna lawikan bû.

“Zû bin, lo!” got. “Wext e ku heyv bihilê.”

Bi xirexirînî bersiv dan û dewamî li kolînê kirin.

“Ha, tiştê le‘în derket. Doxtor tu dê 5 dolarên din jî bidî me, an ne dê li vir bimîne,” got Potter.

“Hela ji xwe re mêze ke ha! Eve yanî çî?” got Doxtor. “We heqê xwe berê xwest û min jî da we.”

“Belê, lê te ji vana zêdetir jî kiriye” got Injun Joe û nêzikî Doxtor bû ku şîpiya di-sekinî. “Pênc sal berî niha, nîveşevê, te

ez ji metbexa bavê xwe der kiribûm. Ez ji bo tişteke xwarinê hatibûm û te gotibû ku ez ne ji bo karekî xêrê hatibûm wir; û dema min sond xwar ku sedsal paşî be jî ez dê tola xwe vekim, bavê te ez xistim girtîxaneyê. Qey te digo ez dê ji bîr bikim?” Kulma wî li ser rûyê Doxtor, gef lê dikirin. Doxtorî nişkê ve ew girt û bi pehînekê ve dirêj kire erdê.

“Ew tu niha li hevalê min dixî!” got Potter, û kêra wî ji destê wî ket. Kêliya din, Doxtor girtibû nav lepên xwe û şer dikirin. Injun Joe bi çavên geş xwe avêt ber pêyên wî û kêra Potter hilda, û li dorra şerkeran bi hêviya fersendekê zivirî. Hema di carekê de Doxtor xwe ji destên Potter xelas kir, textikê stûr ê gora Williams girte destê xwe û pê textik lê xist. Di wê kêliyê de, ji melezî re fersend çêbû û kêr heta destik di sîngê Doxtor ra kir. Doxtor qulib ser Potter û xwîna wî gurrbû ser wî. Di wê gavê de, ewran derdor bi



tariyê pêça û her du lawikên bizdiyayî di  
tariyê de bilez çûn.

Pîştî bîstekê, gava heyv dîsa hilat, Injun Joe li ber herdu mirovan disekinî. Cendekê Doxtor yê mirî şeland. Paşî jî, kêra qesasî kire nav destê rastê ê Potter, û li ser sîndoqê rûnişt. Pênc deqîqe buhurîn ku Potter hêdî hêdî liviya û naliya. Kêr di nava destê wî yê vekirî de bû, kêr rakir û lê nihêrî û berda da bikeve. Paşê cendek dehf da û rabû şipiya, li cendek nihêrî û paşê jî li dora xwe. Çavên wî ketin nav çavên Injun Joe.

“Xweda, ev çi ye Joe?” got.

“Îşekî pîs e” got Joe. “Te bo çi kuşt?”

“Min! Ne, min nekuşt!”

“Li vira binihêre! Ev gotinên te bêfayde ne.”

Potter lerizî û rengê wî spî bû. “Min digo ez serxweş nabim îşev. Çi îşê min hebû min vexwar. Lê hêj di bîra min de ye. Ez serî bo binî di nav heriyê de me; çu tişt nayê bîra min. Bo min rastiyê bêje Joe, dostê qedîm, ma min kuşt? Joe, niyeta

min qet ne ew bû, bi şeref û namûs niyeta min ne ew bû Joe. Ka ji min re bêje çawa çêbû Joe. Weyy, qebehet e lo! Zilamê hind ciwan û jêhatî.”

“Çawa? We herduyan şer dikir, wî tixekî req li te da û tu bi erdê ve pahn bûyî. Paşê tu rabûyî şîpiya, wekî gêja bûyî û dişiliyayî; wextê ku wî dê yeke xweş li te bixista te kêr girt û di sîngê wî ra kir, û heta niha tu vezelî bûyî, qasî darekê bêruh û mirî.”

“Weyy, min nedizanî ka min çi dikir. Heke min kuştibe, însellah dê aniha bibime meyt û gêr bibime ser erdê. Ez bêjim hemî ji ber araqê çêbû û ji ber heyecanê. Min heta niha çu caran çek û sîleh negirtibû destê xwe, Joe. Joe, kesî re nebêje! Erê Joe kesekî re nabêjî, Joe dostê baş. Min her hez ji te kiriye û rêza te girtiye. Qey nayê bîra te?” Û belengazê jar, li ber qesasê rast ket ser çokên xwe û çû destên wî.

“Belê, tu bo min her rast û durist bûyî Muff Potter û ez xayîniyê li te nakim. Êdî çi bêjim, ev gotin, gotinên mirovekî durist in.”

“Oxx, Joe tu melayîket î. Heta ez dimirim ez dê her duayan bikim bo te.” Û dest bi giriyê kir.

“De de, bes e hinde. Ne dema nûzenûzê ye. Tu bikeve rêya hanê û ez jî di wê rêyê re herim.”

Di wê nayberê de, her du lawik heta gund bezîbûn.

Bi bêhna çikiyayî, li ber debaxxaneya kevin sekinîn.

“Huckleberry,” Tom bi pistepist, “tu bêjî tiştek dê bibe.”

“Heke doxtor Robînson bimire, ez bawer dikim ku dê cezayê sêdarekirinê bidin.”

“Kî dê bibêje? Em?”

“Tu çi dibêjî lawo? Bizane ku tiştek qe-

wimî û Injun Joe nehate sêdarekirin! Wê çaxê, em muheqqeq mirî ne, niha nebe jî demeke din dê her me bikuje. Niha, guhê xwe baş bide min Tom, were em sond bixwin -divê em viya bikin- sonda neaxiftinê bixwin. Lê divê li ser tiştêkî evqas mezin nivîs hebe. Her wiha xwîn jî.

Tom textikekî dara qajê hilda ku li bin ronahiya heyvê mat disekinî, qetekî tebeşîrê ji berîka xwe derxist, di ronahiya heyvê de ew rêzikên hanê bi dilkeserî û bêserûber nivîsîn:

“Huck Finn û Tom Sawyer sond dixwin ku li ser vê meselê çu caran neaxivin; û heke carekê behsê lê bikin, bila di ciyê xwe de qelib bidin û birizin.”

Hucklebery li pêş destnivîsa Tom û zelaliya zimanê wî şaşwaz bû. Tom benik ji derziyekê jê kir, û her yekî tiliya xwe ya beranê kun kir û dilopeke xwînê guvaşt. Tom nermoka tiliya xwe wek pênûsekê bi kar anîbû, û piştî hindêk guvaştinê karîbû





herfên ewil ên navên xwe binivîse. Paşî nî-  
şanî Huckleberry da ka çawa H û F'yan çê-  
ke, û bi wî awayî sonda xwe tamam kirin.  
Textikê xwe li nêzîkî dîwêr veşartin.

Paşî ji hev veqetiyan. Heynê Tom di  
pencereya odeya razanê re ket hundir, şe-  
vê cihê ji şefeqê re dihişt. Cilên xwe der-  
xistin û di xew re çû.

Dor nîvro, hemî gundî bi xeberê tirse-  
hêz veciniqîn. Kêreke xwînî li rex kuştî  
hatibû dîtin; û yekî tê derxistibû ku kêr,  
ya Muff Potter bû.

Hemî gundî pêl pêl ber bi goristanê ve diçûn, xwe Huck û Tom jî. Muff Potterê xerîb li nêzîkî wan deran hatibû girtin û çavên wî bi tirsê ve pir bûbûn. Heynê komsêr ew anî ciyê rûdanê, Potter li ber kuştî sekinî, rûyê xwe xiste nav destên xwe û berda giriyê.

“Hevalno, min nekuşt,” bi girîn, “bi şeref û namûs min nekuşt.” Çavên wî li Injun Joe ketin û qêriya, “Ji wan re bêje Joe, ji wan re bêje!”

Tom û Huck kerr û lal disekinîn û lê dinihêrîn, û wan paşî bihîst ku derewîn dibêje ku Potter Doxtor kuşt. Potter birin girtîxaneyê.

Sirra Tom ya tirsnak û hişên wî, heta heftiyekê piştî rûdanê jî ew di xewê de nerihet dikirin. Di vê dema xembariyê de her roj nebe jî her du rojan carekê, Tom diçû ber pencereya biçûk a girtîxaneyê, û qasî ku ji destê wî dihat ji Potter re, anku ji qesas re, tiştên biçûk dibirin.

#### 4. Jiyana korsaniyê

**T**om êdî ji wan derdên xwe yên sirr û veşartî xelas bûbû. Yek ji sebebên vê-ya ew bû ku wî ji xwe re tişteki nû peyda kiribû ku pê re mijûl bibe. Backy Thatcher êdî nema dihate dibistanê. Nexweş bû. Heke bimiraya? Xweşiya jiyane nema bû.

Dawiyê, spêdeyekê li dibistanê, Backy di derî re daket, û dilê Tom heina dê bi-qulibiya. Kêliya paş, wî dest pê kiribû di-qêriya, dikenî, dida dû lawikan, herçend rîskeke mezin bû jî xwe li ser sêncê re di-

avêt, teqle vedidan, li ser serê xwe disekinî... Xulase, hemî hunerên xwe yên qehremanî nîşan didan. Di wê gavê de çavekî wî jî li derve bû ka Beckyê li wî dinihêrî an na. Lê, wê çu caran berê xwe neda aliye wî. Gelo mumkun bû ku haya wê ji wî nebû? Bêtir nêzîk bû; li dorê bi qêrînên kefxweşiyê ve dizivirî, kumê lawikekî girt û fire da ser banê dibistanê, ket nav komeke lawikan û her yek ji aliyekî ve xist, û bi xwe jî kete ber difna Beckyê, hindik mabû ku wê biêşîne. Becky bi awayekî pozbilind zivirî, wî bihîst ku wê got: "Himm! Hindek mirov xwe zor jêhatî dizanin, hergav qirdikî û lewçetiya dîkin."

Niha, hişê Tom hatibû serî. Yekî melûl û dilzar bû. Yekî hêlayî, yekî bêkes û bêheval bû; digot ku kes ji wî hez nake; belkî gava ku ew pê dihesin ku çî lê kirine li ber wî bikevin; wî dixwest ku tiştên rast bike û bi wan re li hev bike; lê ji ber ku ji

bilî xelasbûnê, bi çu awayên din ev yek pêk nayê, bila wesa be.

Di wê navberê de, qederekê berjêrî Mêrga Laneyê, dûrî dibistanê ketibû. Tam li wê derê, rastî hevalê xwe yê dilsoz, Joe Harper hat. Tom ku bi huçikên xwe ron-dikên çavan ziwa dikirin dest bi gazinde-yan kir. Behsa zehmetî û bêkeyfiya li nav malê kir û jê re digot ku biçin derve û ca-reke din venegerin.

Jixwe Joe jî ji bo ku tiştên wesa ji Tom re bibêje hatibû. Dayika Joe, ji ber xwari-na hindêk kremayê li wî xistibû; diyar bû



ku dayika wî jê bêzar bûbû, û dixwest ku here ciyekî din. Ji ber ku ew wesa difikirî, ji bo Joe jî tenê rêyek hebû: Devjêberdan. Joe hêvî kir ku dayika wî kêfxweş bibe û peşîman nebe ku berê kurê xwe daye nav wê dinyaya zalim, ku tê de tûşî nexweşîyan were û bimire.

Dema rê ve diçûn, li ser vê hindê li hev kirin ku her tim yekûdu biparêzin, bibin birader û heta mirinê çu caran ji hev cuda nebin. Paşî dest pê kirin planên xwe danîn. Bi ya Joe, ew dê bibûna evdal û di şkefteke dûr de bi çinik û bermayên nan îdara xwe bikirana. Lê piştî ku li fikrên Tom guhdarî kir, wî jî qebûl kir ku di jiyaneke bêqanûn de tiştên seyr û enteresantir dê hebûna; ji ber wê hindê, qirar dan bibin korsanên deryayê.

Sê kîlomêtre jêrî St. Petersburgê, ciyekî ku Rûbarê Mississipi bi qasî kîlomêtrekê fireh dibû, cezîreyeke darî, teng û dirêj hebû. Çu kes li wir nedijî; li ber perava



dûr, li rex daristaneke firawan bû. Yanî Cezîreya Jackson hatibû hilbijartin. Wan dê li wê derê talana kê rakira? Ev mesele, qet ne li ber guhê wan bû. Paşî wan Huckleberry jî gihande xwe; Huck zûka tevli wan bû ji ber ku hemî cure kar ji bo wî eynî bûn. Xatir ji yekûdu xwestin ku nivê şevê, li ciyekî du kîlomêtre raserî gund bihêne cem hev. Kelekeke biçûk hebû li wê derê ku dilê wan pê ketibû. Her yekê dê nîk û şewk, û her çi xwarina ku karibûn bidizin bianiyana.

Dor nivê şevê, Tom hat di dest de goştê beraz yê biraştî, li ser kendalekî bilind li ciyê jivanê nihêrî. Ji ronahiya stêrkan pê ve çu ronahî nebû; û herwiha pir jî kerr û bêdeng bû. Rûbarê mezin, mîna

okyanûseke peng û mend pahn bû. Tom fîtiyekî sivik da. Ji jêrî kendal cewaba wî hat.

“Kî ye li wê derê?”

“Tom Sawyer, Reşekorsanê Spanyolî. Navên xwe bêjin.”

“Huck Finnê Lepsorîn; û Joe Harperê Xofa Behran.” Tom ew navên nihênî di kitêba xwe ya xweşdivî de dîtibûn û dabûn hevalên xwe.

Paşê, Tom goştê beraz di ser kendal de gindirand û bi xwe jî da dû.

Xofa Behran çêniyeke goştê pişta beraz anîbû. Finnê Lepsorîn jî miqilkek û qederekê tûtinê dizîbû û herwiha hindek dari-kên garis jî anîbûn ku qelûnan pê çêkin. Reşekorsanê artêşa Spanyolan got ku bê agir çênabe. Kê pê dizanî kibrît çi ye wê demê! Nîv kîlomêtre raserî ciyê wan di kelekekê de agirekî geş pêş çavan ket. Bi dizî ve xwe gihandine wê derê û bizotek jê birin.



Zêde tê ve neçû diyar bûn, Tom li ciyê kaptan, Huck li bêra piştê û Joe li pêşiyê. Kelek di nîvê rûbar re derbas bû, lawikan berê wê ber bi jêr dan û rûniştine ciyên xwe. Rûbar zêde kûr nebû, loma zêde boş jî nebû. Nêzîkî saetekê, çu kesî deng nekir. Niha kelek, li rasta gundekî dûr re derbas dibû. Ronahiya du sê lembeyan ciyê gund nîşan dida.

Bereberê saet duyê serê spêdê, kelek li ciyekî xîzî sekinî ku du kîlomêtreyan durrî serê Cezîreya Jackson bû. Di nav avê de bi bela û kutek hatin û çûn heta ku hemî barê xwe kêşane ser cezîreyê.

Ciyekî bîst-sî mêtreyan di nav daristana tarî de, li rex kutikedarekê agirek vexistin. Ji bo şivê hindêk goştê piştê beraz di nav miqilkê de biraştin û nîvê darikên germokên xwe jî xesar kirin. Di wê cezîreya bêmirov de, ziyafeta durrî pêjna insanan tişteki pir xweş bû; û digotin ku çu caran venagerin nav mirovan.


“Pir xweş e, ne wesa?” got Joe.

“Erê mala te!” got Tom. “Niha hevalan em bidîtana dê çi bigotana?”

“Çi bigotana? Ew dê bidiriyana ji bo ku li ciyê me bin, ne wesa Huck!”

“Welleh ez jî wesa dibêjim,” got Huckleberry. “Bira, her çi halê heyî ez li rewşa xwe memnûn im. Bo min tiştê ji vêya xweştir qet nîne.”

“Welleh, ji bo min jî heyata ser darê dinyayê ye” got Tom. “Tu ne mecbûr î ku serê spêdê hişyar bibî û biçî dibistanê, serê xwe bişoyî, û ew cure karên le’netî bikî. Lawo li korsanekî deryayê binihêre, çu



erk û mecbûriyetên wî nînin, lê kêliya ku dikeve nav mirovan, rebenê Xwedê êdî mecbûr e ku here dêrê, yanî xweşiya jiyanê wî jî xelas dibe êdî.”

“Erê welleh wesa ye,” got Joe. “Lê, bi rastî min ev yek nedizanî. Bêje gelek sebeb hebûn ku ez bibim korsan, û niha bûmê.”

Hêdî hêdî axaftina wan qediya û xewa wan hat. Huck zûka di xew re çû, lê tirsek ket nava dilê Tom û Joe. Digotin qey reva wan xeletî bû. Paşê jî, fikra goştê diziyê kirin. Qirarek dan ku di heyata xwe ya korsaniyê de careke din diziyê nekin. Vê carê bi dilrehetî di xew re çûn.

Heynê ku Tom serê spêdê hişyar bû nezani ka li kû derê bû. Rabû şipiya, çavên xwe miz dan û li derdora xwe nihêrî. Paşî hişê wî hate serî. Şefeqeke hênîk bû û dîtina wan daran aramiyek dixiste nava dilê mirovî. Tom korsanên din jî hişyar kirin, hema di gavê de xwe tazî kirin û

bazdane rûbarê. Di nav ava kê m de teqle vedan û yekûdu qelibandin. Qet bîra gundê biçûk nedikirin ku li dûryana pişt rûbarê bêliv û bizav disekinî. Pêlên rûbarê keleka wan biribû, lê ne xema wan bû, ji ber ku çûna kelekê, wek şewitîna pira di navbera wan û mirovan de bû.

Dîsa vegeyane kampa xwe û agirê kampê gurr kirin. Huck kaniyeke ava sar û zelal peyda kir û lawikan ji pelên daran şerbik çêkirin; êdî dê ji dêvla qehweyê av vexwarana. Heynê Joe ji bo taştê goştê beraz hûr dikir, Tom û Huck jê re gotin ku bila bîstekê bisekine; li qeraxa rûbarê li ciyekî baş sekinîn û tora xwe weşandine nav avê; hema bêje di gavê de xelata xwe standibûn. Bi hin lewregên cuwan û çend cure masiyên din ên biçûk ve vegeyayan. Ligel goştê beraz masiyên xwe jî biraştin û pir heyirîn ji ber ku di heyata xwe de masiyên ewqas tamxweş nexwaribûn.

Piştî taştê, xwe dirêj kirine bin siya da-

rekê, di wê navberê de Huckî cixareya xwe kêşa. Paşî daketine nav daran ji bo ku derûdora xwe binasin. Birreke tiştan peyda kirin ku dilê xwe pê xweş bikin. Dîtin ku cezîre qedere pênc kîlomêtreyan dirêj û qedere nîv kîlomêtreyê jî berûn bû; û di navbera wê û perava jê herî nêzîk de jî, tenê tengavek hebû ku nêzîkî dused mêtreyan fireh bû. Serê saetê avjenî dikiirin, loma heynê vegeyane kampê, êdî bûbû piştî nîvro. Ewqas birçî bûbûn ku xîret nekirin masiyan bigirin, lê ketine ser goştê beraz û zikê xwe pê têr kirin. Paşê xwe avêtin bin siya darekê û dest bi suhbetê kirin. Mitî û bêdengiya daran û hizrên tenêtiyê, fikrên lawikan têk dan. Kertin nav fikar û mitaleyan. Hesteke xerîb li wan peyda bû, bêriya malê dikirin. Xwe Finnê Lepsorîn jî xeyala derecank û warîlên xwe yên vala dikir. Lê yekî ji wan nediwêrî behsa wan hestên xwe bike.

Ji dûr ve dengekî xerîb hate guhên


wan. Bêhnekê herder bêdeng ma û paşî gurmêneke kûr li dûryanekê belav bû.

“Ev ne birûsk e” got Huckleberry.

Rabûne şipiya û bilez ber bi perava ali-yê gund ve beziyan. Di nav çiloyên qeraxê re li rûbarê nihêrîn. Bota biçûk, qedere du kîlomêtreyan li jêrî gund bû û bi saya pêlan diçû. Li ser guvertayê birreke mirovan hebûn. Li derûdora botê qiyame-tek kelek hebûn, lê lawikên me têngihiştin ka wan mirovan çi dikir. Piştî bêhnekê, nişkê ve dûkeleke spî li qeraxa botê rabû. Heynê ku ew dûman belav bû û mîna ewrekî spî lê hat, lawikan eynî ew gurmêna sist dîsa bihîst.

“Min zanî!” qêriya Tom. “Yek xeniqiye!”

“Erê welleh!” got Huck. “Dema havîna din Bill Turner xeniqî dîsa wesa kiribûn; topekê diavêjine nav avê, û ew wî derdixe ser rûyê avê. Erêê, dû re pariyên nan dinin û ciwayê dixine nav û berdidine ser



avê û her çî ciyê ku yek lê xeniqîbe, pariyên nênan diçin û li wê derê kom dibin.”

“Xwezî ez niha li wê derê bama,” got Joe.

“Xwezî ez jî” got Huck. “Min hemî tiştê xwe dê bidaya ji bo ku bizanim ka ew kî ye.”

“Gelî hevalan,” got Tom. “Ez dizanim ew kî xeniqiye! Ew em in!”

Di gavê de hesta qehremaniyê li wan hasil bû. Serkeftineke pirr hêja çêbûbû; ew winda bûbûn; şîniya wan dihate girtin; dil ji bo wan diêşiyar; ya ji hemîyan çêtir jî, gundî hemî li ser wan diaxiftin û

lawikan çavnebariya wan dikir. Eve pîrr baş bû. Korsan jî ber heqê xwe diket.

Gava tariya êvarî daket, bot vegeriya û kelek giş ava bûn. Korsanên me vegeriyane kampa xwe. Ji ber nav û dengê xwe yê nû û nerihetiyên mezin ku ew jê re bûbûn sebeb pîr kêfxweş bûbûn. Hindek masî girtin, şîv çêkirin û şîva xwe xwarin, û paşê jî dest bi texmînan kirin bê ka gundî derheqê wan de çi difikirîn û çi digotin. Lê gava siya tariyê xwe bi wan ve aland, hêdî hêdî axaftina xwe birîn û çav li çirûskên êgir kutan. Niha çu heyecana wan nemabû û Tom û Joe bi qet nedikarîn xwe ji fikra malîyên xwe xelas bikin. Ji fikra wan kesên ku mîna lawikan bi wê lîstoka mîzûr kêfxweş nebûn. Bêtir nerihet û xemgîn bûn; du sê axînen kûr derçûn.

Bi derengiya şevê re pêşî Huck di xew re çû, paşê jî dest bi xirexirê kir. Dû re jî Joe. Tom, bêhnekê xwe li ser enîşka dirêj kir û li wan mêze kir. Dû re rabû şîpiya.



Bi hişyarî hêdî hêdî di nav daran re derbas bû heta ku zanî têra xwe ji wan dûr ketiye; paşê bilez ber bi girê xîzî ve bezî.

Piştî du sê deqîqeyan, Tom ber bi peravê ve diçû. Heta ku kûrahiya avê gihişte zikê wî, nivê rêya xwe qedandibû; ji ber pêlan nedikarî zêdetir bi pêya here, lewre di sêsed mêtreyên mesafeya mayî de melevanî kir. Li rasta peravê, di nav daran re çû. Bo saet dehan kêmek mabû ku gihişte ciyekî berçav û nêzîkî gund. Da nav kolanan û bîstoka din li ber sêncê piştê yê mala Xaleta xwe bû. Ji sêncê derbas bû û di pencereya hêwanê re li hundirê malê nihêrî, ku mûmekê ew der ronî dikir. Xaleta Polly, Sid, Mary û dayika Joe Harper li wê derê rûniştibûn û diaxiftin. Li rex textê nivînan bûn û texte di navbera wan û derî de bû. Tom ber bi derî ve çû û bi hişyarî destikê derî rakir; paşê hêdî hêdî pê lê kir, û qirçênî ji derî çû; dîsa hêdî hêdî pê lê kir, û her cara ku qirçênî derket ve-

ciniqî heta dît ku êdî dikarî li ser çokan têkeve hundir.

“Çima mûm wesa li ba dibe?” got Xaletta Polly. “Çima? Ez bêjim derî vekirî ye. Ka here bigire Sid!”

Tom tam di wext de kete bin textê nivînan. Paşê, xwe heta ber piyên Xaletta xwe xuşand.

“Lê wek min digo,” got Xaletta Pollyê, “ne lawikekî xerab bû, tenê hindekî fe’l xerab bû û hew. Tenê hindekî sûtara torî, hindekî serserî, hûn dizanin êdî. He ma bi qasî canîkekê xem hildigirtin. Çu caran niyeta xerabiyên lê nebû û lawikê herî dilgerm bû” û dest bi girî kir.


“Bi Xwedê Joeyê min jî wesa bû. Her gav li dû şeytên û mizûriyan bû, lê hindî ku bêjî jî nazik û birehm bû. Bo Xwedê xeletiyêke mezin bû ku ji ber kremayê min ew girand. Min qet negote aqlê xwe ku min ew krema bi xwe avêtibû, ji ber ku êdî tirş bûbû; careke din wî li ser darê

dinyayê nabînim!” Û Xanima Harper wesa bi keser giriya ku te digot qey dilê wê parçe parçe bûye.

“Weyy, Xanima Harper,” got Xaleta Pollyê, “Ez nizanim ez ê çawa wî ji bîr bikim! Sebra min bû ew, her çi qas eziyet li dilê min ê pîr dikir jî. Lê niha, ji hemî mizûriyên xwe dûr e.”

Ji bo pîrejinekê ev êş pîr zêde bû, loma hema aqlê wê çû. Tom di bêvila xwe de bêhn vedida û niha ji hemî kesî zêdetir ew di xema xwe de bû. Guhên xwe zêdetir li axaftinên wan bel kirin û têgihişt ku gundiyan wesa difikirî ku ew li nivê tengavê wêdetir xeniqîbûn. Ji ber ku gundiyan dizanî ku lawikan baş melevanî dikir, texmîn dikirin ku di ciyên nêzik de nedixeniqîn. Şeva Çarşemê bû. Heke heta yekşemê nehêne peydakirin, dê hêvî li wan bête birîn û duaya cenazeyên wan dê bête xwendin.

Xanima Harper bi girîni “şevbaşek” da



û zivirî ku derkeve. Paşî, wan herdu xwe-  
diyên miriyan xwe berdane hembêzên

hev û heta rihet bûn giriyan, paşî ji hev cuda bûn.

Xaleta Polly, kete ser çokên xwe û bi dengê xwe yê zîz, bi gotinên evînbar du-ayeke ewqas hestiyar û jidil kir ku hêj ne-qedandibû dîsa da giriyê û ser û çavên wê bi rondikan şil bûn.

Tom, piştî ku Xaleta wî ketibû nav nivînan jî gelek bêdeng û bêliv disekinî, ji ber ku wê carinan axînen bikeser vedidan. Lê dawiyê kerr bûbû, tenê carinan hindêk nirmenirm dikir. Niha, lawik ji nav ciyan derket û ber bi nivînen Xaleta xwe ve çû, bêbizav li wê nihêrî. Dilê wî pê şewitî. Tewiya û lêvên wê maçî kirin, û rasterast derket, derî jî dû xwe re girt.

Dîsa, berê xwe da ber perava li hemberî cezîreyê, bi melevanî gihişt cezîreyê û vegeriya kampa korsanan.

Di wan du sê rojên paş de, çûne nêçîrê, ji xwe re leyîstin, xwe li avê dan û sîrkek çêkirin ku sê cembazan lê dileyîst. Lê ga-

va bûbû roja îne, wan hemiyan ew qas bê-riya malê fikir ku êdî nema dikarin ber xemên xwe bihewiyên.

Joe got, “Gelî hevalan, werin em dev jê berdin. Min divê biçim malê. Bêhna min pir teng bû.”

“Ne ne Joe, tu dê hêdî hêdî fêr bibî.” Got Tom. “Kuro hema tenê masîgirtina li vir bifikire.”

“Min çî bi masiyan! Min divê herim malê.”

“Lê Joe tu ciyekî weha peyda nakî ji bo avjeniyê.”

“Avjenî xweş nîne. Çawa be jî bo min ne muhîm e. Ciyê ku çu kes lê nebe, ez ji we re bêjim, ez avjeniyê nakim. Niyeta min ew e ku ez biçim malê.”

“Hey Xweda ha, bebîlok! Ez bêjim tu dixwazî dayika xwe bibînî.”

“Erê, ez dixwazim dayika xwe bibînim, heke te jî yek heba te jî dê bixwesta. Ez ne

ji te zêdetir bebîlok im.” Û Joe hindekî bêhna xwe veda.

“Baş e, em berdî ku bebîka berşîr biçenîk dayîka xwe, ne wesa Huck? Tu dixwazî li vir bimînî, ma ne wesa ye Huck? Em ê bimînî, ne wesa?”

Huck bêdilî got, “E-e-r-ê”

“De tu here Joe” got Tom. “Da ku herkes bi te bikene. Oxx mala min! Tu çi korsanekî jêhatî yî! Ez û Huck, ne bebîkên mizmizî ne. Em ê bimînî, ne wesa Huck?”

Niha Huck got, “Tom, ez jî dixwazim biçim. Jixwe bêhna mirov li vir teng dibû, îcar dê xerabtir be. De em jî biçin Tom.”

“Nayêm! Hûn hemî herin heke we bivê. Ez ê bimînî.”

“Tom, min divê tu jî werî. Tu vê mesele baş bifikire. Li ser perava aliyê din em ê li benda te bin.”

“Baş e, hûn ê gelek li benda min bimîn-

nin, wa ye min got.”

Huck jê dûr ket, û çavên Tom li dû Huck man. Wî hêvî kir ku hevalên wî rawestin, lê hêdî hêdî dane nav avê.

Dû hevrêyên xwe re beziya, gazî wan kir, “Rawestin, rawestin ez dê tiştêkî bêjime we.”

Sekin dan û berê xwe dane wî. Heynê ku Tom gihişte nik wan, dest pê kir ji wan re sirra xwe aşkera kir. Heta ku zanîn Tom meseleyê bi kû ve dibe lawikan lê guhdarî kir, paşê dest pê kirin bi qîrînî çepik ji bo wî lêdan û gotin “pir baş e!” Gotin, heke wî berê ji wan re bigotaya, wan qet daxwaza çûnê nedikir.

Lawik bi kêfxweşî vegeriyan û jidil dest bi sporên xwe kirin. Hergav behsa plana mezin a Tom dikirin û ji ber aqlê wî diheyirîn. Roja paştir, yekşemê, lawikan piştî nîvro her ji xwe re leyîstin.

Gava ku sibeha roja paştir wextê dibistana yekşemê qediya, zengilê ji rojên din



cu datir lêda. Yekşemeke pir kerr û bê-  
deng bû. Gundî hêdî hêdî dihatin, lê ewil  
li ber derî disekinîn û li ser wê qewimîna  
nexweş hindêk pistepist dikirin. Lê, li dê-  
rê ji tu kesî dengê dernediket. Heta hin-  
gê, dêr çu caran hind tijî nebibû. Heynê  
ku Xaleta Polly, dû wê jî Sid û Mary û  
malbata Harperî ketin hundir, -hemiyar  
cilên reş ê tarî li ber bûn- civat rabû şipi-  
ya û wesa sekinîn heta ku ew li rêza pêşîn  
rûniştin.


Paşî, keşeyî dua kirin. Îlahiyeke fesîh  
xwend, û pend û weaz dan.

Di merasîmê de, keşe behsa wan başi-  
yên lawikan, serkeftinên wan û soza wan  
a mezin kir ku êş kete dilê her kesê li wê  
derê ji ber ku wan bi tenê xeletî û xerabi-  
yên lawikên reben dîtibûn. Keşe rûdane-  
ke pîr diltezîn jî li ser jiyana wan ên win-  
da qise kir ku tebîetê wan ê şirîn û camê-  
rane nîşan dida. Niha mirov pê dihesiyar  
ka ew roj çî qas xweş û birûmet bûn. Her

ku çîroka xemgîn dewam kir, civat zêdetir xemgîn û hestiyar bû heta ku dûmahîkê çu kes nema ku neketibe nav koroya giriyê. Waiz bi xwe jî bi ya hestên xwe kir û li ser mîmberê da giriyê.

Xiştexiştêk çêbû li eywanê, lê çu kes pê nehesiya; piştî deqîqeyekê qirçeçirçek li deriyê dêrê hat; keşe çavên xwe yên şil di ser desmalê re dan wî alî û wesa ziq û aliqî ma! Pêşî cotek û paşê coteke çavên din dan dû çavên keşe, û paşê civat hema bi yekcar rabû û çav li lawikan kutan ku di korîdorê re ber bi wan ve dihatin. Pêşî Tom, dû wî Joe û Huck li dawiyê! Xwe li eywana dêrê veşartibûn û guhê xwe didane pendên cenazeya xwe!

Xaletta Polly, Mary û Harperan hema xwe avêtin ser veşartibûnê xwe an jî miriyên xwe yên veşartibûnê, ser û çavên wan bi maçan dagirtin. Di vê navberê de Huckê xerîb pir nerihet bû û nedizani ka çi bike an jî çawa xwe ji wan awiran xelas



bike. Êdî, hêdî hêdî bi dizî ve diçû ku Tom ew girt û got: "Xaleta Polly, bi Xwedê ev ne durist e. Divê hindêk jî bi dîtina Huck kêfxweş bibin."

"Erê welleh tu rast dibêjî. Min dîtina wî pê xweş e, sêwiyê xerîb!"

Nişkê ve keşe bi hemî dengê xwe qêriya: "Ji oo Xwedayê rehman dua bikin, bixwînin, jidil bistirên!"

Û wî xwend û stra. Dema ku îlahiyê dilên kelekvanên me lerizand, Tom Sawyerê korsan li derûdora xwe nihêrî û xwe xwe got ku ew birûmettirîn gava emrê wî bû.

Tom, wê rojê, li gor hal û hewesa Xaleta Polly car pêhn car jî maç xwarin, ji maç û pêhnên ku salek bû xwarî zêdetir.

Tom çî bûbû qehremanekî li nava gund! Ne bi bazdan an jî helkehelk, lê bi ezameta korsanekî bi rê ve diçû. Lawikên ji wî biçûktir li ber daw û delingên wî kom dibûn. Wek ku ew daholvanekî serê

govendê bû lawikên derûdora wî kombûyî xwe serbilind dihesibandin. Lawikên hevtemenên wî jî wesa diyar dikirin ku hîç nizanîbûn ka ew dûr ketibû; lê li wî dihesidîn. Wan ê her tiştê xwe bidaya ji bo ku li ciyê Tom bin. Li dibistanê, biçûkan ewqas behsa wî û Joe dikir ku di demeke kurt de bûbûn qehremanên dibistanê.

## 5. Dadgeha Muff Potter

**T**ehtîl hat. Becky Thatcherê ku piştî “xeniqîna” Tom, bi vedîtina wî pîr kêfxweş bûbû, çûbû mala xwe da ku tehtîlê ligel dêbavên xwe bibuhurîne. Loma êdî ji bo Tom çî xweşiya jiyanê nemabû.

Sirra tirsnak a rûdana kuştinê, xemeke zor mezin bû. Doza rûdana kuştinê, li ber dadgehê bû. Hemî gundî pê diaxiftin û Tom jî nedikarî xwe ji wan axaftinan dûr bixe. Her gotina ser wê rûdanê dilê Tom dilerizand. Wê kurtepiştê hergav ew nerihet dikir, ji ber vê hindê, wî Huck bire ci-

yekî talde û tenha da ku pê re biaxive. Hindek axiftin û zimanşilkirinê dê ew ri-  
het bikirana.

“Huck, te çu tişt li ser wê got?”

“Li ser çi?”

“Tu dizanî li ser çi?”

“Haa, helbet ne.”

“Çu tişt?”

“Qet gotinek jî, îcar bizane. Heke tişte-  
kî wesa çêbûbûya em du rojan jî sax nedi-  
man. Jixwe tu jî vêya dizanî.”

“Huck, çu kes nikare te bide axiftin, ne  
wesa?”

“Min bide axiftin? Heke min bixwesta  
ku ew melezê şeytan min bixeniqîne, wê  
gavê wan dikarî ez bidama axiftin. Çu rê-  
kên din nînin.”

“Baş e, mesele nîne vêga” got Tom. “Ez  
dibêjim, hindî ku em kerr bimînin tişte-  
kî bi me nayê.”

“Lê, axiftin tenê Muff Potter, Muff Pot-

ter, Muff Potter e hergav. Ez pir nerihet dibim û xwêdan didim.”

“Derdora min jî wesa, eynî wesa ye. Ez dibêjim ew çûyî ye. Dilê te pê naşewite qet?”

“Hergav, hergav” got Huck. “Çu caran xerabiyek li kesekî nekiriye. Tenê, hindê caran ji bo pereyê eraqê masiyan digire û torî û beredayî digere; lê em hemî vêya dikin, kê m zêde em hemî. Bi rastî jî ew yekî pirr baş e, carekê, masiya wî têra du kesan nedikir lê dîsa jî nîvê masiyê da min; û gelek caran dema ku halê min nexweş bû û bêşans bûm li ber min disekinî.”

“Erê welleh, firfirokên min tehmîr kirine, Hucko, wî nîkên şewkê min girêdane. Xwezî me bikariya ew ji wê derê derxista.”

“Weyy ezo, em nikarin wî derxin, Tom. Herwiha ew ê kêrî tiştêkî jî neyê; ew ê careke din wî bigirin.”

Lawik dûr û dirêj axiftin, lê dilê wan



zêde jî rihet nebûbû. Wekî her carên berê kirin, -kerr û bêdeng çûne hucreyê- û tûtin û kibrît dane Potter. Li ser erdê bû û çu gardiyan jî nebûn.

Her çî cara ku Potter ji bo diyariyên wan malavayî li wan fikir, wan xwe gelek sûcdar hest dikir; wê carê zêde zêde nerihet bûn gava Potter got: “We gelek xêr û çakî li min kirin lawikno, li wî gundî ji



her kesî zêdetir. Ez ji bîr nakim, ji bîr nakim. Belê min tişteki pirr xerab kir lawikîn, di wextê rûdanê de serxweş û gêjbûm, tenê ji ber vê ez sûcdar im, û ji ber vê ez dê bême sêdarekirin, ew jî rastiya min e. Rast e, û ez bêjim ya herî baş e jî. Baş e, em li ser vê meselê neaxivin. Ez naxwazim cergê we reş bikim.”


Tom bi xemgînî vegeriya malê û wê şevê di xewa xwe de xewnên tirsnaq dît. Roja paş û ya paştir li derûdora avahiya dadgehê çerixî; dilekî wî digotê ku here hundir, lê wî xwe bi zorî radigirt û nedîçû hundirê avahiya dadgehê. Li aliyê Huck jî heman tişt hebûn. Di dawiya roja duyem de, hemî gundî wesa difikirîn ku delîlên Injun Joe rast û qahîm in û çu şik li ser qirara ku Jury dê bide nînin.

Wê şevê Tom heta dereng li derve ma, tişteki dikir, û di pencereyê re hate ser nivînên xwe. Zêde zêde bi heyecan bû. Çend saet derbas bûn heta ku di xew re

çû. Ji ber ku dê bûba rojêke muhîm, hemî gundî serê spêdeyê daketine avahiya dadgehê. Piştî bîsteke dirêj, Jury kete hundir û endamên Juriyê rûniştine ciyên xwe. Hema dû re Potterê betilî û bêhal, yê bitirs û bêhêvî bi zincîran anîne hundir û li ciyekî li ber hemî çavên meraqdar ew dane rûniştin. Injun Joe jî li ciyekî berçav bû, wek her caran kerr û bêdeng. Bîsteke din jî sekinîn û paşê hakim kete hundir û komsêr dadgeh da destpêkirin.

Niha gazî li şahidekî kirin ku digot, wî, serê spêdeya roja rûdana kuştinê, Muff Potter li bîrê dîtibû û Potter nişkê ve reviyabû. Piştî hin pirsên din dozger got: “Şahid bibin.”

Girtî kêliyêkê çavên xwe rakirin, lê gava dît ku parêzerê wî bi xwe dibêje “çu pirsên min nîne” çavên xwe dîsa xistin ser hev. Şahidê li dorê, peydakirina kêrê li rex cendekî selimand. Dozger got “Şahid bibin.”



“Min çu pirs nîne ku lê bikim” got parêzerê Potter.

Şahidê sêyem sond xwar ku, wî gelek caran ew kêr li cem Potter dîtibû.

“Şahid bibin.”

Parêzerê Potter çu pirs lê nekirin. Neri-hetiyek li rûyên haziran peyda bû. Qey wî parêzerî dixwest ku riha muwekilê xwe bêyî ku tiştekî bike bavêje tehlûkeyê?

Du sê şahidan behsa hereketên sûcdar ên Potter kirin ku li ciyê rûdanê dîtibûn.

Bêyî ku rastiya şahidan bête lêpîrsîn hatin berdan.

Şahidên durist, hemî detayên rûdana li goristanê gotin, lê parêzerê Potter çu pîrs li wan nekirin da ku li rastiya wan qanîh bibin.

Niha Hakim got: “Bi sondên camêrên ku çu şik li gotinên wan nînin, me zanî ku girtiyê bêbext (Potter) sûcdarê wê kuştinê ye. Em navberê didin dadgeha xwe.”

Axînek ji Potterê xerîb rabû, rûyê xwe xiste nav destên xwe û bedena xwe bi paş û pêş ve hêdî hêdî hejand. Bêdengiyêke xemnak kete hola dadgehê. Gelek mêr hestbar bûbûn û gelek jin jî digiriyan. Parêzer rabû û got: “Di beyana xwe ya serê wê dozê de, me diyar kiribû ku muwekkilê me, ew sûca xedar, di bin tesîra alkola zêde de kiribû. Me fikra xwe guhert. Em vê parastinê vedikişin.” Berê xwe da mubaşîr û gotê, “Gazî li Tom Sawyer bike!”

Rûyê Potter jî tê de, li hemî rûyên di holê de şaşwaziyeke tevlîhev peyda bû. Heynê lawik rabû û çû ser kursiyê gelek bitirs bû.

“Thomas Sawyer, tu li hevdehê Hezîranê, dor nîvê şevê li kû derê bûyî?”

Çavên Tom, bi rûyê Injun Joe yê hesinî ketin û zimanê wî sekin da. Guhdar, kerr û bêdeng sekinîn; lê çu gotin ji Tom der nediketin. Piştî du sê çirkeyan, hindek quweta lawik careke din çêbû û got: “Li goristanê!”

“Ji kerema xwe hindek bi dengtir. Me-tirse, Tu li?..”

“Li goristanê.”

Bişirîneke weşiyane li ser rûyê Injun Joe çêbû.

“Tu li ciyekî nêzîkî gora Horse Willamsî bûyî?”

“Belê ezbenî.”

“Bideng biaxivê. dilopekê bidengtir. Tu

çi qas nêzîk bûyî?”

“Qasî ku nêzîkî we me.”

“Tu veşartî bûyî, an na?”

“Veşartî bûm.”

“Li kû?”

“Li pişt reşdarên qeraxa gorê.”

Injun Joe hêdîka dest pê kir.



“Çu kesek ligel te?”

“Belê ezbenî, ez bi...”

“Bisekine, bisekine deqîqeyekê. Dev ji

navê hevalê xwe berde. Em ê wî wextekî musaît bînin ser kursiyê. Tiştêk ligel te hebû?”

Tom dudil bû û hindekî tevlîhev diyar kir.

“Bi deng kurê min, şermê neke. Rastî hergav birûmet e. Te çi ligel xwe biribû?”

“Tenê pisîkeke mirî.”

Pirqênîyek kete nav holê, lê wezîfedarên dadgehê ew kerr kirin.

“Em ê skeletê wê pisîkê çêkin. Niha lawo, her tiştê ku qewimî ji me re bêje. Çawa dizanî wesa bêje, çu tiştî neqevêze û metirse.”

Tomî pêşî bi dudilî dest pê kir, lê her ku li meseleya xwe germ bû gotinên wî gelek hêsantir derhatin. Di gaveke qurt de, ji bilî dengê wî hemî deng biriyan; hemî çav li wî hatin kutan; bi lêvên jihevketî û bêhnên çikiyayî haziran bêyî ku li wext binêrin, ji ber çîrokê heyirîmayî lê guhdarî dikirin. Heynê lawik got, “û Dox-



tor texte anî û Muff Potter kete erdî, Injun Joe kêr di dest de pengizî û...” heyecan gihişte asta herî bilind.

Tirreeqqq! Bi qasî birûskê bilez beziya Melez (Injun Joe), li nav ewqas kesan filitî û çû!

Tom, careke din jî qehremanekî mezin bû, kevirên sikaka, îro hatine ber şibaka. Navê wî ket nava rûpelên çapemeniyê jî, rojnameya gund derheqê wî de tiştin nivîsîn. Niha, gundiyan Muff Potter hembêz dikir.

## 6. Li dû xizîneyê

**R**ojên Tom pir xweş bûn, lê şev ji bo wî Rmîna demsalên tirsê bûn. Di her xewneke wî de Injun Joe hebû û her car bi dawiyeke xerab ji xewê hişyar dibû. Huckê reben jî hema di eynî rewşa tirsê de bû. Tom, şeva beriya roja dadgehê, çîrok ji serî heta binî ji parêzer re gotibû. Loma, Huck gelek ditirsiya ku dê tiliya wî ya di nav wî karî de aşkera bibûya.

Tom heroj, bi spasiyên Muff Potter re kêfxweş dibû ku axiftibû; lê şevan dixwest ku devê xwe qet venekira. Nîvê ca-

ran Tom ditirsiya ku Injun Joe çu caran neyê girtin; nîvê din jî ditirsiya ku bê girtin. Baş dizanî ku heta ew mirov nemire û meytê wî bi çavên xwe nebîne, dilê wî ri-het û hêmin nabe.

Çakiyek jê re kiribûn; seh kiribûne hemî deran, derûdorê gişê lê geriyabûn lê Injun Joe peyda nebûbû.

Rojên havînê yên hêdî li paş diman û her roja ku diçû barê tirsî Tom siviktir dikir.

Di jiyana her lawikekî de wextek tê ku lawik dixwaze here dû xizîneyeke veşartî. Rojekê, ew daxwaz li Tom peyda bû. Rastî Huck hat û jê re behsa wê kir. Huck ji mêj ve amade bû bo tiştêkî wesa.

“Em dê kû derê bikolin?” Wî pirsî.

“Ohhooo” got Tom, “hema her derê.”

“Çima, qey li her derê hene?”

“Na, bi rastî na. Li ciyên pirr xusûsî de veşartî ne ew Huck; carinan li cezîreyan,

carinan di sîngên rizî yên bin çiqleke dara hişk û pîr de, tam li ciyê ku nîvşevê sî dikevê; lê gelek caran di bin zemînê xaniyên cinî de.”

“Kî wan vedişêre?”

“Kî? Diz helbet, te digo qey kî?”

“Nizanim. Heke ez bama, min venediştart; min dê xerc bikira û kêfa xwe pê bikira.”

“Bi Xwedê min jî. Lê diz wesa nakin. Ew her car vedişêrin û li wê derê dihêlin.”

“Êdî dû re venagerin çu caran?”



“Ne, ew dibêjin ku dê vegerin, lê gelek caran nîşanan ji bîr dikin an jî dimirin. Çawa be jî, li wê derê demeke dirêj dimîne û zingarî dibe. Kevne xaniyê cin li hêla Xaniyê Kerr e, û li wê derê gelek darên tavhişk hene.”

“Di bin wan hemiyên de hene?”

“Kuro tu çi dibêjî! Ne!”

“Wê çaxê, tu ê çawa bizanî ka em dê biçine kîjanê?”

“Em ê biçine hemiyên!”

“Çima lawo, em dê tevahiya havînê pê ve bin?”

“Baş e, ev çawa ye? Wesa bizane ku em ê ji wê dara tavhişk a pîr dest pê kin heta aliyê din ê hêla Xaniyê Kerr?”

“Min qebûl e.”

Dû re tewr û bêrên xwe hildan û ketine rêya xwe ya pênc kîlomêtreyan.

“Ka bêje Huck, heke me xizîneyek li vir peyda kir, tu dê bi pişka xwe çi bikî?”

“Ez? Ez dê heroj pîzzayekê û kolayekê bikirim, û dê biçime her çi sîrka ku tê gund. Tu ê bi yê xwe çi bikî, Tom?”

“Ez ê trampêteke nû, şûrekî û kravateke sor û golikekê bikirim û ê bizewicim.”

“Bizewicî!”

“Eynen wesa.”

“Tom, bi Xwedê hişê te ne li cî ye.”

“De hadê de, em herin bikolin.”

Nîv saetê kolan û xwêdan ji bedena wan hate xwarê. Çu tişt pê ve nehat. Nîvsaeteke din jî kolan bêyî ku tişteki bibînin. Huck got, “Gelo her car evqas kûr çal dikin?”

“Carinan, ne hemî caran. Gelek caran ne. Ez bêjim, em ne li ciyê rast in.”

Lewre ciyekî nû peyda kirin û dest bi kolînê kirin. Pê de pê de, Huck got, “Xwedê qehra xwe lê bike, dibe ku em dîsa li ciyekî xelet bin.”

“Tişteki zor ecêb e, Huck. Ez tişteki tê-

negihiştım. Hii, min zanî mesele çi ye!  
Em çi gêl û gêjên Xwedê ne! Divê ewil bi-  
zanî bê ka nîvşevê sîbera çiqlê darê dike-  
ve kû derê û paşê bînî wê derê bikolî!”

“Ya star, me evqas kar bi bê çi û çineyî  
kir? Baş e, ez ê îşev bêm û bimewtim.”

“Baş e.”

“Lawik di wext de li wê derê bûn. Ciyê  
sî ketiyê nîşan kirin û dest bi kolînê kirin.  
Bîr her ku diçû kûrtir dibû. Dawiyê Tom  
got, “Tişteke pê ve nayê, Huck, em dîsa xe-  
let in.”

Huck bêra xwe berda. “Bes e,” wî got.  
“Divê em dev ji vêya berdin. Herwiha tiş-  
tên wiha pir xerab in. Li vir, vê heynê şe-  
vê bi cin û ruhên ku li dora me dizivirin  
ve. Tu dibêjî qey tişteke li pişt min e her-  
gav; û ez ditirsim berê xwe bidim pişt xwe  
ji ber ku belkî hindekan li wê derê xwe li  
ber min danîbin. Di wextê ku ez hatime  
vir ve ez her ji tirsê dilerizim. ”

“Welleh Huck, ez jî her wekî te me.”

“De vêca Tom, em dev ji vir berdin û ciyekî din biceribînin.”

“Baş e, ez jî wesa dibêjim. Xaniyê bi cin î. Erê!”

“La’net lê bê, ez hez ji xaniyên cinî nakim Tom. Ê tu jî dizanî ku mirovên normal ne li rojê, ne jî şevê naçin dora wî xaniyê cinoyî.”

“Lê cin bi roj nagere, çima em bitirsin?”

“Baş e, tamam e. Heke tu wesa dibêji em ê bi Xaniyê Cinî ve mijûl bibin, lê ez wesa difikirim ku şansên me bêhûde diçin.”

Di vê navê de berê xwe dabûne binevana girî û di nav daran re diçûne malê.

Roja paştir, dor nîvro her du lawik gihiştine dara hişk; ji bo amrazên xwe hatibûn. Heynê ew gihiştine Xaniyê Cinî, bêdengiyêke pirr xerîb hebû, ji ber vê hindê pêşî tirsîyan têkevin hundir. Paşî, xwe ber bi derî ve xuşandin û awirek avêtine hun-



dir. Wan odeyeke bêzemîn a kevzgirtî, kûlengeke kevn, pencereyên vala, deren-cekên rizî; û vir de wir de li her derî tev-nepîrk dîtin. Çûne hundir, bi pistepist di-axiftin. Wan dixwest ku li tebeqa serî bi-nêrin. Alavên xwe avêtine kuncikekê û hilkişiyên. Li serî dîsa eynî îşaretên wêra-niyê hebûn. Ew tam dê biçûna xwarê û dest bi kar bikirana ku...

“Hişş!” got Tom.

“Ew çi ye?” Bi pistepistî got Huck.

“Ew tam ji pişta derî tên.”

Lawikan xwe dirêj kirine ser zemîn, çavên xwe xistin nav derz û qelîştekekên nava texteyan.

Du zilam ketin hundir. Her lawikekî ji xwe re got, “Wa ye Spanyolê pîr ê kerr û lal ku ew demek e li dora gund bû, mêrikê din qet pêş çavên min neketibû.”

Mirovê din, yekî perritî bû ku çu tiştê xweşik li rûyê wî nebû. Spanyol li nav se-rapeyekê de bû; biskên spî lê bûn; pora

spî û dirêj di bin kumê wî dihejiya. Heynê ew hatin hundir, “yê din” bi dengekî nizm diaxift. “Ne” digot wî, “tişteki xeter e.”

“Xeter!” bi hurrîn got Spanyolê kerr û lal, lawik heyirî man. “Tirsonek!”


Bi bihîstina dengî ve bêhna lawikan çikiya û lerizîn. Dengê Injun Joe bû!

Zilaman hindek xwarin derxistin û firavîn çêkirin. Injun Joe got, “Berê xwe bigire vir, tu vegere here serê rûbarê, ciyê ku tu jê hatî. Ez ê bi tenê careke din şansê xwe biceribînim ku herim nav gund. Em ê wî îşê “xeter” piştî ku min hindek casûsî kir bikin. Paşê ber bi Teksasê! Em ê bi hev re bikin.”

“Baş e” her du mêrik dibawîşîn, û Injun Joe got, “kurmê serê min rabûye bo xewê! Nobeya te ye.”

Gelek nekêşa ku her du mêrikan bi hev re dikir xirexir.

Lawikan bêhneke xweş û kûr kêşa.



Tom bi pistepist: “Niha şansê me ye, were!”

Huck: “Ez nikarim, heke ew hişyar bin ez dê bimirim.”

Tom xurtî lê kir, Huck xwe paş ve da. Dawiyê Tom hêdika û bi hişyarî rabû û bi tenê meşiya. Lê pêngava wî ya yekem qirçêneke wesa ji zemîn derxist ku kêma ma- bû di nava tirsê xwe de bimire.

Niha xirrînek sekinî bû. Injun Joe rabû şipiya, li dora xwe nihêrî, girnijîneke req berda ser hevalê xwe ku serê wî diket ser çokên wî. Bi piyên xwe ew hejand û got, "Tu nobedar î, ne wesa! Şukur dîsa jî tişte tek neqewimiye!"

"Ay mino! Ez razabûm?"

"Pîçekî. Roj dihile dosto; bo me wext e ku em bi rê kevin. Em ê bi pereyê xwe yê kê m çi bikin?"

"Ez nizamim, bi ya min wek hemû caran li vir bihêlin. Heta em diçin başûr ne hewce ye ku em wan ligel xwe bigerînin. Pereyekî bihayê şeşsed dolaran tişteki zêde ye bo gerandina ligel xwe."

"Baş e, rast e, em ê careke din jî bêne vir. Niha em dê tenê veşêrin."

"Fikreke baş e!"

Lawikan hemî tirs û xemên xwe di wê gavê de ji bîr kirin. Bi çavên zîq her hereketên wan temaşe dikirin. Bextê qenc! Şeşsed dolar têrê dikir ku dûzîneyeke la-

wikan pê zengîn bibin! Ev baştirîn rêka xizînegêrîne bû; êdî ne hewce bû bifikirin bê kû derê bikolin!

Wextê Joe bi kêra xwe dikolî, kêra wî li tişteki ket.

“Merhebaa!” Wî got.

“Ew çi ye?” got hevalê wî.

“Ez bawer dikim ku qûtiyek e.” Di kuneke li ser zemîne texte re destê xwe gi-handê û qûtî derxist. “Kuro, eve pere ne.”


Her du mêrikan, diravên di çengên xwe de kontrol kirin. Ew zêr bûn!

Hevalê Joe got, “Em lezê lê bikin da ku qûtiyên din jî derxin. Li wê kuncikê, tewreke kevn î jengî heye.” Bezî çû tewr û merreyên lawikan anîn. Injun Joe tewr hilda û qûtî ji erdê derxist.

“Heval” got Injun Joe, “Bi hezaran dolar hene li vir.”

“Em dê çi li van bikin, dîsa çal kin?”

“Erê.”



Bi vê cewabê ve, Tom û Huck pir kêfxweş bûn.

Paşî Injun Joe got, “Ne! Bi navê Xweda-

yê mezin, ne! Kêm mabû ku min ji bîr dikir. Li ser vî tewrî axa terr hebû. Çi karê tewr û mereyan li vir heye? Kê ew anîne vir, û ew bi xwe çûne kû derê? Çi! Em dîsa çal bikin, û bên bibînin ku erd hatiye hilweşandin? Ne welleh. Em dê bibine şkefta min.”

“Çima? Helbet! Tu dibêjî Numere Yek?”

“Ne, Numere Du, li binê xaçê. Ciyê din pir xerab e, gelek di bin dest û lepan de ye.”

“Baş e. Hema têra xwe tarî ye ku em dest pê bikin.”

Injun Joe rabû û çû ber pencereyan, çavên xwe li derve gerandin. Paşê got, “Tu bêjî kê ew tevr û bêr anîbin vir? Tu bêjî ku ew li tebeqeya jorê bin?”

Bêhna lawikan çik bû. Injun Joe kêra xwe girte destê xwe û berê xwe da pêlikan. Qirçîniya pêngavan dihate tebeqeya jorê heynê ku texteyên rizî dipelçiqîn, û

Injun Joe li ser derenceka xerabe sekin da.

“Baş e niha ev bo çi ye?” got hevalê wî.  
“Heke kes bin û li jorê bin, berde bila li wê derê bin, ji me re çi? Heke niha xwe bavêjine xwarê, kî ê jê re bêje ne? Di panzdeh deqîqeyan de dinya ê tarî be; û berde heke hez bikin bila dû me re werin. Ez bêjim, her kê ew tewr û merre li vir hêlabin, em dîtî û em şibandine ruhan an jî cinan an jî tişteki din. Ez bêjim ew hêj jî direvin.”

Joe bêhnekê kire pitepit, paşê qebûl kir ku diviya wan ji bo derketinê xwe amade bikira. Piştî bîstekê, ji xanî derketin, û bi qûtiyên xwe yên biqîmet ve ber bi rûbar ve çûn.

Tom û Huck rabûne şîpiya, betilîbûn. Di nav qelşên kutikên xanî re li wan mêze kirin. Dû wan re çûn? Nexêr! Wan gelek pê xweş bû ku bêyî ku stûyên wan bêne şkandin careke din pê li erdê bikin û ber bi gund ve bimeşin.



## 7. Şkeft

**H**eftiya paştir, Tom bihîst ku malbata Judge Thatcher vegeriyaye qesebeyê. Hem Injun Joe hem jî xizîne êdî ewqas ne muhîm bûn, Becky bûbû elaqeya wî ya serreke. Wî Becky dît û wan bi hevalên xwe yên dibistanê re wextekî pirr xweş bi leyîstinê buhurandin. Roja wan bi tişteki xweş bi dawî hatibû: Beckyê bi dayika xwe dabû qebûlkirin ku roja paştir, şemiyê, geşteke ji bo hemî hevalên wê durist bike û hemî bi hev re biçine seyranê.

Spêdeya roja paştir, di saet 11ê de ko-

mek hevalên wê li mala Judge Thatcherê kom bûbûn û ji bo çûnê her tişt amade bû. Keçên hejdeh salî û du sê zilamên ciwan ligel zarokan diçûn. Bota kevn (ku bi hilmê diçû) ji bo wê rojê hatibû karkirin. Sid nexweş bû û nedikarî tevlî şahiyê bibê; Mary li mal sekinî da ku bi Sid re bileyîze.

Bot, pênc kîlomêtre jêrî gund, li devê korteke bi dar û devî sekinî û hate girêdan. Qerebalix, ber bi peravê ve meşiya, û qêrîn û tîqetîq barandin. Piştî xwarinê, li bin siya darberûyên rêz de bêhna xwe vedan û suhbet kirin. Pê de pê de, yekî kire gazî: “Kî tê şkeftê.”

Hemiyana xwe kar kir. Bexçikên mûman gerandin û hemiyana ber bi gir ve baz da. Devê şkeftê, li qeraxa gir bû, û deriyê wê dişibiya herfa A'yê. Deriyê ji darberûyên girj, vekirî xuya dikir. Tê de odeyeke biçûk hebû bi qasî sarincekê sar. Dîwarên odeyê ji kilseke req bûn û teniyekê mîna

xwêdana zuwa rûyê dîwêr vegirtibû.

Li vir, di nav tariyeke mişt û kesîf de sekinîn, û temaşekirina newala şîn a di bin rojê de dibiriqî, tişteki pir romantîk û efsûnî bû. Lê, paşî meşê dîsa dest pê kir. Meşa zarok û jin û zilamên ciwan, dergehê rêçê dixitimand. Ronahiya mûman a lertzok, dîwarên zinarî, şêlû didan diyarkirin. Şkefta McDougal labîrenteke pîrr mezin bû, labîrenteke ji kolanên xwaromaro ku diketin nav hev û dîsa jêk vediqetîn û dawiyê jî nedigihîştin çu ciyan. Digotin ku mirov, di nav tevliheviya wê de bi şev û rojan digere lê çu caran dawiya şkeftê peyda nake. Hindî ku mirov ber bi jêr ve diçe têrê nake, heta binê erdê hêj jî jêr ve diçe, her tim eynî: Labîrent di bin labîrentê re.

Kom, qedere sê niv kilomêtreyekê, li rêça sereke bi hev re meşiya. Paşê grub û cotan xwe berdan nav rêçên cuda cuda. Pê de pê de grub li dû grubê vegeriyan de-

vê şkeftê, bi awayekî bêhnçikiyayî, lê ji ber xweşiya rojê dilşad. Heynê pê hesiyan ku haya wan bi wextê rojê nîne û bo şevê kê mî maye, li xwe heyirîn. Bot, bi rêwiyên xwe yên bi heyecan kete nav pêlan û ber bi malê ve çû.

Di wê gavê de Tom û Becky li paş mabûn. Wan, ciyên şkeftê yên çavnas bi hevalên din re dîtibûn. Paşî, çavgirtînkê dest pê kiribû, û Tom û Becky heta ku jê biwestin leyîstibûn û ber jêrî rêçeke çep û fetlonêk ve çûbûn. Mûmên xwe bilind kirin û nav û tarîx û sloganên li ser dîwarên şkeftê xwendin ku bi dûxana mûman hatibûn xêzkirin. Wextê pê hesiyan ku niha li ciyekî şkeftê bûn ku çu kesî dîwarên wê xêz nekiribûn, hêj diçûn û diaxiftin. Navên xwe, li bin refeke hilawistî nivîsîn û dane rêya xwe. Piştî bêhnekê, hatine ciyekî ku avê dilop dikire ser texteyekî. Li piştî wê, pêlikeke xwezayî û rep û qît peyda kirin. Li wê derê nîşanek danan da ku



paşê rê nîşanî wan bide. Dû re dest bi lêgerînê kirin ku şkeftê zêdetir kifş bikin. Li vî alî wî alî ve meşiyar, ketin nav kûrahîyên şkeftê ku kesî pê nedizanî. Nîşaneke din jî çêkirin û ji hev cuda bûn da ku

tiştên nû peyda bikin û ji yên din re bibêjin.

Gihîştine kaniyeke li nîveka şkeftokê. Dîwarên şkeftê, bi stûnên fantastîk hatibûn ragirtin ku bi lihevketina bizmîlûg û stalagmîtên mezin, bi nizilîna avê ya bi sedan salan şikl girtibûn. Li bin bîn, şevşevokên mezin xwe bi hev ve girtibûn, di her komê de hezaran ji wan; ronahiyê, rihber nerihet kirin û sedo sedo xwe berdane xwarê; bi qîjeqîj û bilez ber bi mûman ve hatin. Tom destê Beckyê girt û ber bi kolana ku wan ewil peyda kiribû ve kêşa; û zêde tê ve neçûbû ku gava Becky ji şkeftokê derdiket, şevşevokê bi perrên xwe li mûma wê xist û vemirand. Şevşevokan, qederekê dane dû wan; lê Tom û Beckyê xwe ji her rêguzara ku wan peyda kirî kutan û xwe ji wan tiştên tirsnak xelas kirin. Piştî bîstekê, Tom goleke binerdî dît û ew rûniştine qeraxê û bîstekê bêhna xwe vedan.



Beckyê got: “Ev bû wextekî gelek dirêj ku me tiştek ji yên din nebihîst.”

“Bifikire Becky, em gelekî li bin wan in, û ez nizanim ka çi qas li başûr an bakur, an jî rojhilatê wan in. Me nekarî wan ji vir bibihîzin.”

“Ez nizanim ka ew bû çend saet ku em li vir in, Tom. Divê em rêka vegeerê bigirin.”

“Erê welleh, ez jî wesa dibêjim. Lê heke şevşevok her du mûmên me vemirînin, em ê bikevine di rewşeke pir xerab de. Em ê rêyeke din biceribînin da ku di wê rêka şevşevokan re derbas nebin.”

“Baş e, hêvîdar im em winda nebin.”

Lê ya rast, ew bêşik winda bûbûn.

Dawiyê, ew bi rêveçûna di nav boran re û bazdana di ser rêçên binerdî re hind westiyabûn ku xwe dirêj kirin û razan. Piştî ku hişyar bûn, wêdetir bi rê ve çûn û hindek ava kanîsarkekê vexwarin. Mûma wan a dawî jî diqediya.



Beckyê got, "Ew dê me winda bikin û li me bigerin!"

"Belê, bêguman ew dê li me bigerin!"

Lawikan, çavên xwe li pîçemûma xwe kutan û li heliyana wê temaşe kirin, û paşê, tirs û xofa tariya kesîf!

Her duyan jî bêhna xwe girt û guhên xwe vekirin. Te digo, dengekî wekî qêrîneke dûr û qels dihat. Di gavê de Tom bersiv dayê. Di dest de destê Beckyê, Tom kolan ber bi jêr ve dadipeland û diçû. Piştî bêhnekê dîsa guhê xwe dayê; dîsa deng hindekî din nêziktir dihat bihîstin.

"Ew in!" got Tom. "Ew tên, Becky! Niha em jê xelas bûn!"

Êdî, hema bêje kêfxweşî xelas kiribûn. Lê diviya ku ew hêdî hêdî biçûna, ji ber ku gelek kûrikên nepenî hebûn û diviya hişyar bûbana. Qasekê pê de, gihiştine ber kûrikekê û mecbûr sekinîn. Dibe ku sê mêtreyan kûr bû, dibe ku sed mêtreyan, jê derbasbûn ne mumkun bû. Lawi-



kan bi destên xwe rêya xwe dîsa ber bi kaniyê ve dan. Wextê mat, tesîra xwe li ser wan kir; dîsa razan, û birçî hişyar bûn. Bi fikra Tom niha roja sêşemiyê hatibû.

Piştî fikrek lê çêbû. Niha di destê wan de qe nebe hindêk rêçên qeraxan hebûn. Ji bo wan, kifşkirina hindêk ji wan rêçan, ji betalî û wext-buhurandinê çêtir bû. Wî darikeke firfirokan ji berîka xwe derxist, bi zinarekî ve girêda; paşê wî û Beckyê dest pê kir, Tom li pêşiyê bû û bi destê xwe rê dişopand. Piştî bîst pêngavan kolan bi “ciyê xwediserreavêtinê (lîtik)” re dawî bû. Tom çok vedan û destê xwe bire jêrî, û paşê bi qasî ku ghiştê destê xwe

dirêjî goşeyan kir. Hewlek da xwe ku hindekî din jî ber bi milê rastê ve dirêj bibe. Wê gavê, ne bi qasî nîv kîlomêtreyan dûr ve, destekî mirovan ku mûmek digirt li pişt zinêr diyar bû! Tom qêrîneke ecêb veda û di eynî gavê de bedena xwedanê destî jî diyar bû: Injun Joe. Tom nekarî bilive. Dema kêliya paştir dît ku Injun Joe vegeheriya, û ava bû, dilê wî rehet bû. Meraq kir ku çawa Joe dengê wî nenasîbû û nehatibû ew nekuştibû ji ber şahidiya wî ya li dijî Injun Joe li dadgehê. Lê, dibû ku olanan dengê wî veşartibe. Nexwest tiştê ku wî dîtî ji Becky re bibêje. Jê re got ku tenê “ji bo şanseki” qêriyabû.

Li ser kaniyê man û her man û ketine xeweke din a dirêj. Zarok hişyar bûn ku kêr maye ji birçîna bimirin. Tom wesa difikirî ku niha roj bûbû nîvşeva çarşemiyê, an jî în, an şemî jî, û dev ji lêgerînê berdabûn. Wî teklîf kir ku rêçeke din jî peyda bikin. Êdî Injun Joe û tehlûkeyên

din ne xema wî bûn. Lê Becky bêhal bû.  
Got ku ew dê li vir, li ciyê xwe bisekine û  
bimire, dê zêde nekêşaya. Ji Tom re got  
ku heke hez bike bila bi xeta benikê firfi-  
rokê re biçe û rêyekê kifş bike.

## 8. Peydakirina xizîneyê

**P**iştî nîvroya sêşemiyê hat û buhurî. Gundê St. Petersburgê ji bo lawikên winda şînî girt. Hêj jî çu xeberên xêrê ji şkeftê nehatibûn. Pirraniya wan dev ji lêgerînc berdabû û dîsa vegeriyabûn jiyannên xwe yên rojane; wan digot aşkera ye ku lawik çu caran nahêne peydakirin. Xanima Thatcher pir nexweş bû. Xemgîniyeke kûr li Xaletta Pollyê peyda bûbû, pora wê ya gewr hema bêje bi tevahî spî bûbû.

Derengê nîvê şevê, zengileke bişid di

nav zengilên gund de lêxist, û di nav de-  
qîqeyekê de cade bi komikên mirovên  
nîvtazî ve tijî bûbûn. Diqêriyan “Peyda  
bûn! Peyda bûn!” Sêniyên teneke û boro-  
zan jî tevli, vê helahelayê bûbûn. Qereba-  
lix ber bi rûbarê ve çû û dîtin ku lawik di  
nav wagonekê de ne û hindek mirov bi  
qareqar wan dikêşin. Gund ronî bûbû; çu  
kes venegeriya nav nivînên xwe; girîngti-  
rîn şev bû ku qesebeya biçûk heta wê ro-  
jê dîtibû.

Keyfa Xaleta Pollyê yekcarî xweş bû û  
ya Xanima Thatcher jî pîçek jê kê. Lê,  
ew jî dê tamam bûba, gava ku qasidê çû-  
ye şkeftê, xeberê xêrê digihande mêrê wê.  
Tom xwe dirêj kire ser somyayekî û ser-  
pêhatiya xweşik got, û behs kir ku wî çawa  
Becky li wir hêla û çû sefera kifşkiri-  
nê; çawa du rêç şopandin bi qasî ku beni-  
kê firfiroka wî digihiştê; çawa rêçeke sê-  
yem heta hemî dirêjahiya benikî şopandi-  
bû, û tam wextê ku dê vegeyriyaya çavê wî



bi peşkeke dūr ketibû ku dişibiya ronahiya rojê; benik berdabû û ber bi ronahiyê ve çûbû, serê xwe û navmilên xwe di kuncikeke biçûk re derbas kiribûn û dîtibû ku Missisipiya mezin zelal diherike! Û heke ew dem şev bûya, wî dê ew peşka ronahiyê nedîta û dê ew bor jî kifş nekira! Qal kir ku çawa vegeriya Beckyê û xeberê xêrê dayê, û Becky çawa ji kêfxweşiya xwe heta ciyê peşka ronahiya şîn lezand; çawa di kuncikê re derket û alî Beckyê kir ku ew jî derkeve; çawa li wir rûniştin û ji kêfxweşiyên xwe giriyan; çawa hin mirov di qeyikekê de derbas dibûn û wî destê

xwe ji wan re hejand û meseleya xwe ji wan re got; çawa mêrikan ewil ji çîroka xedar bawer nekirin û gotin “ji ber ku newala ku şkeft lê ye bi pênc kîlomêtreyan jorê ye”. Paşî ew birin malekê, şîv dane wan, heta du sê saetên pişt tariyê îstirehet kirin û ew anîne gundî.

Berî şefeqê, Judge Thatcher û du sê peygerên pê re, li şkeftê hatibûn peydakirin û xeber dabûne wan.

Du sê heftî piştî xelasiyê, Tom êdî Becky nedidît. Hakim û du sê heval bi Tom re ketibûn axiftinê, û yekî jê re wek henek pirsî, ka careke din nedixwest here şkeftê. Tom got ku ew qet tişteki wesa nafikire.

Hakim got, “Tom, yên mîna te gelek in. Lê me tedbîra xwe girtiye. Êdî çu kes di şkeftê de winda nabe.”

“Çima?”

“Ji ber ku du heftî berê, min deriyê wê ye mezin bi hesin ve da asêkirin û bi sê ci-




yan mifte kir; û mifte li nik min e.”

“Weyy, Hakim beg, Injun Joe di şkeftê de ye!”

Di nav du sê deqîqeyan de xeber belav bûbû. Dûzineyek qeyikên tijî mirov rêya xwe dane aliyê şkefta McDouglas û paşê jî bota tijî rêwî da dû wan. Tom Sawyer di wê qeyikê de bû ku Judge Thathcher pê vegeyriyabû.

Gava deriyê şkeftê hat vekirin, di nav nîvtaritiya şkeftê de dîmenekî pirr dilsoj diyar bû. Injun Joe li ser erdê dirêj bûbû, mirî, rûyê wî li ber derza derî. Dilê Tom pir pê disot, ji ber ku bi tecrûbeyên xwe dizanî ka wî xerîbê Xwedê çi qas êş û azar kêşabû. Dilê wî êşiyabû, lê niha xwe rihet û hêmin hest dikir. Bi vî awayî, pê hesiya ka ji wê rojê ve ku li dijî wî mirovê bedbext î çavsor şahidî kiribû, tirseke çi qas mezin ketibû dilê wî.

Injun Joe nêzîkî devê şkeftê hate veşartin; û bi wagon û qeyikan mirovên



qesabe, çewlig û gundên derûdorê hatin serdana wî.

Spêdeya piştî roja cenazeyê, Tom Huck kêşa ciyekî tena da ku tiştên girîng jê re bibêje.

“Huck, ew xizîne li şkeftê ye.”

“Çi? Ka cardin bêje Tom.”

“Pere di şkeftê de ne.”

“Tom, tu bi Xwedê, tu henekan dikî an rast dibêji?”

“Rast kuro rast; bi qasî ku ez di jiyana xwe de rast û durist bûme rast. Tu ê bi min re werî wê derê û arî min bikî ku em wê ji wir derxin?”

“Erê welleh ez dê bêm! Ez dê bêm he-  
ke em rêya xwe heta wê derê ronî bikin û  
winda nebin.”

“Huck, em dikarin vêya bikin bêyî ku  
hindî serê misqalê zerar bigihe me. Kurte-  
rêyek heye ku ji bilî min evd û beşerê  
Xwedê pê nizane. Ez ê te bi kelekekê ras-  
terast bibim wê derê.”

“De em rast herin Tom!”

“Baş e. Ji me re hindek goşt û nan, qe-  
lûnên me, yek an du çenteyên biçûk, du  
an sê şirîdên firfirokan, û hin ji wan tiştên  
nûjen ku jê re “kibrît” dibêjin lazim in. Ji  
te re bêjim, wextê ez di şkeftê de bûm,  
min gelek caran digot xwezî min hindek  
kibrît hebana.”

Kelekek emanet wergirtin û dest xwe  
de bi rê ketin. Wextê ku qederê pênc  
kîlomêtreyan hatin jêrî rûbarê, Tom got,  
“Niha tu dibînî, ew kendalê bin şkeftê he-  
mî wekhev diyar dike; ne malek e, ne da-  
ristanek e, hemî çiloyên wekhev. Lê, tu

wî ciyê hanê dibînî ku erdê bin wê herifiye? Belê, ew nîşaneke min e. Niha em dê biçin peravê.”

Peya bûn.

“Huck, tu aniha dikarî xwe bi darikê şewkê xwe bigihînî wê kuncika ku ez jê derketibûm. Lê bigere ka tu ê peyda bikî.”

Li hemî ciyan geriya, çu tişt peyda nekir. Tom, bi quretî, ber bi komeke mezin a teraşên simaqê ve meşî û got, “Aha eve ye! Lê binêre Huck! Li vî pesar û gundewarî ciyê herî xef û nediyar eve ye.”

Tom li pêş, di kunê re derbas bûn. Ber bi ciyê herî dûr ê borî ve çûn. Paşê benikên xwe yên firfirokan li zinaran girêdan û dewam kirin. Piştî du sê pêngavan gihiştin ber kaniyê. Berdewam kirin û piştî bêhnekê, kolana Tom ya din peyda kirin û tê perîn heta ku gihiştin ciyê “xwediser-ravêtinê.” Bi ronahiya mûman aşkera bû ku ew ne zinarekî zinar bû, lê girekî tûj î ji heriyê bû ku qederê 20-30 mêtreyan jî

bilind bû. Tom bi pistepistî: “Niha ez ê tişteki nîşanî te bidim, Huck”

Mûma xwe bilind kir û got, “Hindî ku çavên te hukmî lê dikin li goşeya dûr binêre. Tu wê dibînî? Li wê derê, li ser zinarê mezin, ji dûxana mûman hatiye çêkirin.”

“Tom, kuro ew xaç e.”

“Li bin xaçê, gêjo? Min tam li wê derê dît ku Injun Joe mûma xwe bilind kir!”

Huck bêhnekê li xaçê mêzand, paşê bi dengêki lertzok got, “Tom, de ka em ji vir derkevin.”

“Çi! Yanî xizîneyê bihêlin?”

“Erê, bihêlin. Esseh, niha ruhê Injun Joe li van deran e.”

“Ne, ne li vir e, Huck ne. Ew li ciyê ku mir li wê derê ye, li dûr, devê şkeftê, heşt kîlomêtreyûn dûrî vir.”

“Ne Tom, ew dê ne li wê derê be, ew dê li derdora pereyan be. Ez dizanim ka ruh

çawa hereket dikin, û tu jî dizanî.”

Tom hêdî hêdî tirsîya ku Huck heq bû. Lê gelek neçû ku fikrek lê çêbû. “Li vir binêre Huck, em çima xwe dixapînin! Ruhê Injun Joe nikare bê li ciyekî ku xaç lê heye!”

“Tom, welleh eve nehatibû bîra min. Lê wesa ye. Şansê me ye ku xaç li vir e. De îca em dakevin û li wê qûtiyê bigerin.”

Li her derê geriyan û bêhêvî rûniştin. Pê de pê de Tom got, “Bi ihtimaleke mezin li bin zinar e. Ez dê heriyê bikolim.”

“Tom, bi rastî ne fikreke xerab e.” Huck got.

Di gavê de kêra Tom derketibû. Hêj nîv mêtire nekolîbû ku kêra wî li texte ket. “Hoo, Huck! Tu evê dibihîzî?”

Niha jî Huck dest pê kir, kolî û axa serê avêt. Hin texte zû de diyar bûn, wî ew derxistin. Di bin wan texteyan de çaleke xwezayî hebû ku ber bi binê zinêr ve diçû. Tom kete nav wê çalê û mûma xwe



bire bin zinêr bi qasî ku bikare dirêj bike. Lê nekarî binê wê bibîne. Xwe tewand û di bin zinêr re derbas bû. Rêka fetlok dewam kir, berî bi milê rastê ve û paşî milê çepê ve. Huck li ser panîyên xwe bû. Tom li dora fetleke kurt zivirî û qêriya: “Ya Xweda, Huck, li vir binêre!”

Esseh jî qûtiya xizîneyê bû. Di şkeftokeke biçûk û nepen de bû û ligel wê jî bîdoneke barûdê, du sê demançeyên di kinên çerm de, du an sê cot solên bêpanî, qayîşek, û hin qirş mirşên ku di bin dilopên avê de av û lêlav bûyî, hebûn.

“Axirîn me peyda kir!” got Huck. “Wey ezo, em zengîn in Tom!”

“Huck, min her dizanî ku em dê rojekê peyda bikin. Mirov jê bawer nake, lê êdî me bi dest xist, esseh!”

Pere ji qûtiyê derxistin û kirin nav centeyên ku wan bi xwe re anîbûn. Paşê jî birin ber zinarê xaçê.

Bêhneke din hatin ber komeke teraşên simaqê, bi hişyarî çavên xwe li derve gerandin, dîtin ku perav bêdeng e û piştî du sê deqîqeyan di qeyikê de firavîn xwarin. Heynê ku roj nêzîkî asoyê dibû wan qeyika xwe pal da û bi rê ketin. Bi tariyê re gihiştin gundê xwe.

“Niha, Huck” got Tom, “em ê pereyan veşêrin bin banê kuxtê jinebiyê. Û ez ê sibe spêdê werim û em ê bihejmêrin û li hev par bikin. Paşî em ê li nav daran, jê re li ciyeke hêmin bigerin.”

Lê, hema gava wan pere veşart Mr. Jones ew dîtin ku derdikevin. Ji wan re



got ku bi wî re herine odeya wêneçêkirinê ya jinebî Douglasê.

Ode, pir ronî bû û her çi kesê ku di gund de piçekî biqîmet be li wir bû. Malbata Thatcheran li wir bûn, ya Harperan, ya Rogersesan, Xaleta Polly, Sid, Mary, keşe, edîtor û gelekên din, hemiyan jî cilên pir xweşik li xwe kiribûn. Jinebiyê, lawik bi qasî her kesekî ku dê du tiştên wesa xuya dikirin hembêz bikirana, ji dil hembêz kirin.

Bi herrî û beza mûman reş bûbûn. Xaleta Polly sor bû, tûkê xwe şîn kir û serê xwe ji Tom re hejand.

Jones beg got, “Min ew bi lez û bez anîn.”

“Te baş kir.” Got jinebiyê. “Zarokno bi min re werin.”

Wê lawik birine odeya razanê û got, “Niha xwe bişon û cilan li xwe bikin. Ha, du dilq cilên nû hene, derpî, gore, hema her tişt tevahî. Li xwe bikin. Em ê li ben-

da we bin, wextê ku we xwe peyt kir werine jêr.”

Piştî jinebî ji odeyê derket, Huck got, “Tom, em dikarin di pacê re derkevin û di ber sacê re dakevin. Gelek bilind nîne.”


“Xwedayê îlahî! Tu bo çi dixwazî wesa bikî?”

“Welleh, ez fêrî qerebalixên wesa nînim. Ez nav wan nahewim. Ez nayême jêr, Tom.”

“Ooo, birader! Tişteke nabe. Binêr ez çawa rihet im. Ez ê li te hişyar bim.”

Piştî pênc şeş deqîqeyan, inêvanên jinebiyê li ser maseyê bûn. Deh danzdeh zarokan xwe avêtin ser maseyên qeraxê, di heman odeyê de. Edetê wî welatî û wî zemanî bû. Jinebiyê got ku ew dixwaze Huck di mala xwe de bihewîne û wî bide xwendin û dema wê pê çêbû jê re karekî deyne.

Dora Tom hatibû. Wî got, “Êdî ji bo Huck hewce nîne. Huck dewlemend e.



Belkî hûn bawer nekin, lê gelek pereyên wî hene. Oho, hûn çima dikenin, ez ê niha nîşanî we bidim. Tenê gavekê bisekinin.”

Tom di derî re baz da. Qerebalixê li yekûdu, û Huck nihêrî, Huckê ku lal bûbû.

“Sid, çi ye tiştê Tom nerihet dike?” got Xaleta Pollyê. “Ma mirov çu caran dikare tiştêkî ji wî kurî fam bike. Çu caran?”

Tom di bin barê telîsê xwe ve hate hundir û Xaleta Polly gotina xwe neqedand. Tom komika diravên zer, gurr kire ser maseyê. “Ha! Min çi gote we? Nîvî yên min, nîvî jî yên Huck in!”

Wê menzereyê bêhna wan çikandibû. Hemiyên çav lê kutan, gavekê gotin ji çu kesî nehat. Paşê, pêwîst bû ku tiştêk hati-ba gotin. Çîroka Tom dirêj bû, lê pir rengîn bû.

Pere hejmartin. Tevahî, ji danzdeh hezar dolaran pîçek zêde bû. Çu kesê ji

hazirên wê derê, ewqas pere bi hev re, di carekê de nedîtibûn.

Bêguman xwendevan qanih e ku pereyên Tom û Huck yên bêwext, gundê St. Petersbourgê feqîr û biçûk pir têk daye. Mîqdareke ewqas mezin, hemî pereyê rastî, hema mirov nedikarî jê bawer bike. Li ser meseleyê gelek tişt hatin gotin, mesele ewqas hate mezin- kirin heta ku hemî xaniyên cinî yên li St. Petersbourg û gundên cîran hatin helweşandin, texte jê hatin derxistin û binêşe hatin kolîn û ji bo xizîneya veşartî hatin serûbinkirin; ne ji aliyê lawikan ve lê ji aliyê mirovên mezin ve. Her çi ciyê Tom û Huck jê derbas dibûn pesnê wan didan, û çav li ser wan diçeçîn. Rojnameya gund çîrokên derheqê jiyana lawikan de çap kirin. Jinebî Douglasê pereyê Huck razande banqeyekê û Judge Thatcher jî li ser daxwaza Xaleta Pollyê heman tişt bi pereyê Tom kir. Niha, her

duyan jî qezencek hebû, ku tenê bi gotinekê: Qerase bû; dolarek ji bo her roja nava heftiyê û nivê rojên yek-semiyan. Wan rojên berê yên sade, dolar û çarêkek têra cî û heinî mesrefên dibistana xwendekarekî dikir. Herwiha ji ber eynî sebebê, têra cil û şuştina wî jî dikir.

Êdî, Judge Thatcher derheqê Tom de fikrên gelek baş hebûn. Wî got ku çu lawikekî normal, dê nekarîba keça wî ji şkeftê derxe. Hakim dixwest ku rojekê Tom wek parêzer an jî eskerekî mezin bibîne. Wî got, wî niyet heye ku tê bixebite da ku Tom ji bo Akademiya Netewî ya Eskeriyê bête qebûlkin. Paşê jî, li dibistana huqûqê ya herî baş a welêt perwerde bibe, bi wî awayî ew ê ji bo yek ji wan kariyeran, an jî ji bo her du kariyeran jî amade bibûya.

Zengîniya Huck Finnî û rastiya ku êdî ew di bin banê xaniyê Jinebî Douglas de bû ew ji civakê re dabû nasandin, ne; ew

rakêşabû, avêtibû nav civakê û êdî nema dikarî li hember wê eziyetê bihewiya. Xudamên Jinebiyê, hergav Huck paqij û serûber digirtin, porê wî şe dikirin û cilên wî firçe dikirin, û li nav foteyên/çarşefên pak dinivandin. Mecbûr bû ku bi kêr û çetelan xwarinê bixwe; mecbûr bû desmalk, piyal, û kasik bi kar bîne; mecbûr bû kitêba xwe bixwîne; mecbûr bû biçê dêrê; mecbûr bû wesa rast û durist biaxive ku peyv ji devê wî pirr nexweş derdiketin.

Sê heftiyên ev eziyet bi sebr kêşa û paşî rojekê nişkê ve winda bû. Çil û heşt saetan, Jinebî li her derê bi xemgînî li wî geriya. Serê spêdeya roja sêyem, Tom aqil kir û çû li nav bermîlên kevn û vala li wî geriya ku li jêrî mezbexaneyê terikandî bûn. Li nav yek ji wan bermîlan Huck peyda kir. Li vir nivistibû; wî hêj nû bi hin tiştên dizî û bermayiyên xwarinan taştê xwaribû. Niha di dev de qelûn, bi re-





hetiya xwe vezilîbû. Huck qirêjî bû, neşekirî, û eynî ew kincirên kevn li ber bûn ku di wan rojên wî yên azad û kêfxweş de ew dixiste halekî ecêb. Tom, nerihetiya wî derxistî jê re got û xurtî lê kir ku vege-re. Mirûzê Huck tirş û şîn bû. Got:

“Behsa wê yekê neke, Tom. Min ceriband, lê çênebû; çênabe Tom. Ne li gorî min e; ez fêr nînim. Jinebî ji bo min baş e û jidil e; lê ez ji ber terza jiyana wan nehewiyam. Ew hemî spêdeyan di heman wextî de min hişyar dike; min dide şuştin, heta diwestin porê min şe dikin; nahêle ku ez li bin daran de binivim; ez mecbûr im wan cilan li xwe bikim ku min lûs û pûs dikin. Tom; tu dibêjî qey ew nahêlin çu hewa bikeve nav hinavên wan; û ew-qas rizî ne ku ez ne dikarim li erdê rûnê, ne xwe dirêj bikim û ne jî li dora kesekî xwe bigevizînim. Ev bû bêje çend sal, ku min xwe li ser deriyekî bodrumê nexuşandiye; mecbûr im ku herim dêrê û

xwêdan bidim û her xwêdan bidim. Ez nefretê li wa'zên wan ên nexweş dikim! Ez nikarim li wê derê pêşûyan bigirim, nikarim benîştê xwe bicûm. Divê yekşemiyê sibê heta evarî sol li piyên min bin. Jinebî, bi dengê zengilê dixwe; bi dengê zengilê diçe nav nivînan; bi zengilê hişyar dibe. Mirov nikare deyx bike.”

“Baş e Huck, lê bizane ku her kes bi wî awayî dike, Huck.”

“Tom, ev ne xema min e. Ez ne her kes im, ez deyx nakim. Wesa destgirêdayîbûn pir xirab e. Bi wî awayî reh pîrr zû dertên, çi tamê ji borek û kulîçeyan wernagirim. Divê iznê bixwazim ji bo çûna masîgirtinê, avjeniyê, ma çi dibû heke ez ne mecbûr bama ji bo her tiştî iznê bixwazim. Belê, ez dê wesa baş biaxiftama, mesele nedibû, ez dê hilkişiyama kuxtikê binsac û min dê qasekê li derve binêriya heroj, ku tamedê bête devê min, heke na ez dê bimirama Tom.

Jinebiyê nedihêla ez cixarê bikêşim; wê nedihêla nik alemê bibênijim û xwe bixurînim. Û, Xwedê wê bihêle, hergav dua û îbadet dikir! Min çu caran jineke wesa nedîtibû! Ez mecbûr bûm birevim. Welê ez mecbûr bûm. Û layê dîtir, dibistan ê vebûna û ez ê mecbûr bibama biçimê. Belê min ê nekariya deyx bikim. Berê xwe bide min Tom, zengînbûn ne wesa ye wek ku ji me re hatiye gotin. Tenê xemgîn û xemgîn, xwêdan û xwêdan e, û daxwaza mirinê ye hergav. Heke ji ber ewqas pereyan nebaya ew hind bela nedihatî serê min; niha tu para min jî bi yê xwe re bibe û carina deh diravan bide min, ne pir caran, ji ber ku ez pere bi tiştêkî nadim heta ku zêde zêde bêçare nemînim, û dê biçî li ser navê min lêborîne ji Jinebiyê bixwazî.”

“Hoo, Huck, tu jî dizanî ku ez nikarim vêya bikim. Ne durist e. Û, layê dîtir, heke tu tenê hindêkî din jî dewamê lê bikî

tu ê hêdî hêdî lê xweş bibî.”

“Ez ê bi dizî ve cixarê bikêşim û cûna bidim” Huck soz da.

“Lê xweş bibim! Belê, heke ez gelek li ser rûniştim ez ê li firneyeke kell jî xweş bibim, ew jî wesa ye. Ne Tom, ez zengîn nabim û ez di wan xaniyên xweşik î la‘netî de namînim. Ez hez ji daran, rûbaran, û bermîlan dikim. Û ez ê bi wan re bimînim. Hemî bila biçin binê ceh-nemê!”

“Lê, Huck, tu dizanî em nikarin te li nav çeteyê bigirin heke tu rêzdar nebî.”

Toz li keyfa Huck rabû. “Nikarin min nav çeteyê de bigirin, Tom? Tu min navêjî der, ne wesa Tom? Tu niha vêya nakî, ne wesa Tom?”

“Huck, min ê nexwesta, û ez nax-wazim; lê xelk dê çi bêje? Dê bêjin, ‘Him! Çeteya Tom Sawyer! Gelek kesên bêçine tê de hene!’ Bi qesta te, Huck. Te ev pê xweş nedibû û min jî pê xweş nedibû.”



Bêhnekê bêdeng ma Huck. Dumahîkê got, “Baş e Tom, heke tu iznê bidî min ku bikevime nav çeteyê, ez ê ji bo mehekê biçim nik jinebiyê û bi wê re bim û dê bibînim ka ez ê karibim bihewim.”

“Temam e Huck, pir baş e! De were, mirovê min ê qedîm, ez ê bêjime jinebiyê ku hindekê sist be bi te re.”

“Tu Xwedê Tom, niha tu ê jê re bêjî? Ê pir baş be. Heke hema li ser meseleyên mezin iznê bide min, ez ê bi dizî cixarê bikêşim û bi dizî dicûna bidim û bi dizî qerebalixê bikim an jî hilweşînim. Tu ê kengî çeteyê bidî destpêkirin?”

“Hoo, aniha. Em ê lawikan kom bikin û belkî îşev teşebbusê çêkin.”

“Çi bikin?”

“Teşebbusê çêkin.”

“Ew çi ye?”

“Ew sondxwarin e ku yek û du biparêzin û çu caran sirrên çeteyê aşkera nekin.”

“Baş e, zor zor baş e Tom, jidil dibêjim.”

“Belê, ez jî dibêjim baş e. Ê ew sondxwarin divê nîvê şevê bê kirin, li ciyekî pir bêdeng, zêde tirsnak ku tu peyda bikî; xaniyekî cinî yê herî baş e, lê niha ew hemî hilweşandî ne.”

“Belê, nîvê şevê baş e, her çi awayî dibe Tom.”

“Erê, wesa ye. Ê divê tu li ser darbes-tekê sond bixwî û bi xwînê îmze bikî.”

“Niha, ev tiştekî xweş e! Ji ber ku hezar caran ji korsaniyê cesûrtir e. Ez ê ligel

jinebiyê bim heta ku dirizim, Tom; û heke ez bibim wêrankerê dizekî, û her kes li ser biaxive, ez bêjim Jinebî ê dilşad be ku ez ji nav şêlavê derxistime û anîme malê.”







Ev çîroka wêjeya amerîkî ku li ser zarokekî  
bêar hatiye ava kirin, ji sala ku hatiye weşandin  
(1876) û vir de tesîrek mezin li ser  
xwendevanan hiştiye.

Xwe ji serpêhatîyeke bi talûke re amade bikin.

Di van çîrokan de hunê gelek tiştan  
ji zarokatiya xwe jî bibînin.



[www.avestakitap.com](http://www.avestakitap.com)

ISBN 978-9944-382-70-0



9 789944 382700

